# İdianame derneket cenazeyê wî derket



Hesabgirê DTP'a ku hatiye girtin yê navçeya Toroslara Edeneyê Osman Yîgît (26) ku di operasyona KCK'ê de hate girtin û nexweşê dil bû, ji ber ku bi awayekî rêk û pêk nehat dermankirin jiyana xwe ji dest da. Ligel ku ev 6 meh in Yîgît hatiye girtin jî hêj dozgeriyê der barê wî de îdianame amade nekiribû. Hêj îdianameya Yîgît nehatibû amade kirin cenazeyê wî derket... *RÛPEL - 3*



# 'Polîsan 255 kes kuştine'

Di van demên dawî de pekutiyên polîsan ên li ser civakê zêde bûye. Li gorî rapora Weqfa Mafên Mirovan ya Tirkiyeyê (TÎHV), di encama tundiya polîsan de, di nava 3 salan de 255 kes hatine kuştin. Kesên ku di hedefa polîsan de 50 jê kuştinên kiryarên wan nediyar, 109 kes bêyî ku bê lêpirsîn kuştin, bi sedema ne sekinîna li ser banga rawestana polîs û guleberdana rasterast hatine kuştin, 96 kesan jî di bûyerên girtîgeh yan binçavkirinan de jiyana xwe ji dest dane... *RÛPEL - 4*

### HEVSEROKÊ BDP'Ê SELAHATTÎN DEMÎRTAŞ NERAZÎBÛN NÎŞANÎ GOTINÊN ERDOGAN DA

# Divê lêborînê bixwaze

**Demîrtaş, gotinên Erdogan ên ji bo bûyerên li Sêrtê ku 'zêde mezin nekin' got ku divê ji bo vê bûyerê qiyamet bê rakirin û divê Erdogan biçe Sêrtê ji zarokan û gelê Sêrtê lêborîna xwe bixwaze**




Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, di civîna Koma BDP'ê de axivî û gotina Serokwezîr a "Zêde mezin nekin" ku ji bo bûyerên tecawizê yên li Sêrtê pêk hatî bi kar anîbû rexne kir û xwest Serokwezîr Recep Tayyip Erdogan ji zarok û gelê Sêrtê lêborînê bixwaze. Demîrtaş, bi vê mebestê jî bang li zilaman kir û wiha got: "Bi vê mebestê bi xwe re hevrû bibin. Heke hemû zilam li hemberî vê trajediyê serî ranakin divê ji mirovahiya xwe fedî bikin û dest bi kar bikin û nerazîbûna xwe ya li hemberî vê yekê derxin holê." Demîrtaş, ji bo 1'ê Gulanê bang li karkeran kir û xwest 1'ê Gulanê bi rihê Newrozê bê pîrozkirin... *RÛPEL 5*


# ROJEV

28 Nîsan - Çarşem 2010 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 kr. Hejmar: 29


# Zanîngeha Dîcle kirine qereqol

Xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê êrîşa polîsan û binçavkirina nêzî 100 hevalên xwe şermezar kirin. Xwendekaran got ku rektora Zanîngeha Dîcleyê Ayşegul Jale Saraç wekî memûra AKP'ê dixebite û li zanîngehan bi riya polîsan serdestiya xwe pêk bîne

### WEKE MEMÛREKE AKP'Ê DIXEBITE

Endama Komeleya Ciwanên Sosyalîst Rojda Varhan diyar kir ku Rektora Zanîngeha Dîcleyê Prof. Dr. Ayşegul Jale Saraç weke memûreke AKP'î dixebite û wiha got: "Qaşo AKP li dijî YOK'ê ye, lê derket holê ku AKP û YOK heman tişt in. Di zanîngeha Dîcleyê de bêtir xuya dike."

### BI GIRSEYÎ BINÇAVKIRIN PÊK TÊ

Varhan diyar kir ku rektor Saraç ji bo çalakiyên herî demokratîk yên xwendekaran jî lêpirsînan vedike û cezayan dide xwendekaran û Varhan wiha got: "Ev jî têre nake zanîngeh kire qereqol. Di bûyera dawî de jî derket holê ku çalakiyên herî demokratîk rastî êrîşan tê û bi girseyî binçavkirin pêk tê.

### ÇALAKIYA RÛNIŞTINA DAN DESTPÊKIRIN

Her wiha xwendekaran xwestin hevalên wan serbest bêne berdan û xwendekaran dan zanîn ku heta hevalên wan bên berdan çalakiya bêdem dan destpêkirin. Xwendekar li pêşiya Zankoya Fen û Edebiyatê hatin cem hev çalakiya rûniştinê dan destpêkirin... *RÛPEL - 4*



**Êrîş şermezar kirin**

*Rektoriya Zanîngeha Dîcleyê (DU), di çarçoveya Şahiya Biharê de li Navenda Kongreyê konserek pêk anî. Komek xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê ku xwestin beşdarî konserê bibin rastî mudaxaleya polîsan hatin. Di pevçûnê de gelek xwendekar birîndar bûn û 100 xwendekar hatin binçavkirin. Xwendekaran êrîş şermezarkirin û rûniştina bêdem dan destpêkirin.*

# Dejeneresyona civakî

Di nava hefteyekê de du bûyer li Sêrtê qewimîn. Her du bûyer jî ji hevdu xirabtir bûn û bi rastî jî asta mirovahiyê ya herî rezîl bû. Vê bûyera qirêj, ya ku li Sêrtê qewimiye bes mînakek e. Hêj gelek bûyerên bi vî rengî hene ê li Sêrtê, li gelek bajaran diqewimin û mixabin dê biqewimin jî. Yekî ku kêm hindik li rewşa civakê binêre dê têbigihê ku bûyerên ku li Sêrtê qewimîn bes du mînak in...

*Nivîsa Mihemed RONAHÎ R.8*



# Cerdevan kirin muxtarê gundê vala

Derket holê ku 13 cerdevanên li Gever û Şemzinanê endamên Meclîsa Şaredariyê hatibûn hilbijartin, li ser daxwaza qeymeqam û fermandarên cendirmeyan, li 13 gundan wekî muxtar hatin peywirdarkirin. Her çiqas li gorî rêziknameyê cerdevan nikarin bibin muxtar jî, li gorî Qeymeqamê Çelê Abdullah Çiftçi ev yek zagonî ye.

# 'Artêşa Tirk PKK'ê tahrîk dike'

Lêkolîner û nivîskar Ayşe Hur anî ziman ku ji ber ku têkoşînên kurdan yên bê çek encam negirtine PKK derketiye holê û di rewşa îro de gelê kurd piştgiriyê dide siyaseta kurd. Ayşe Hur diyar kir ku bi hatina biharê ve TSK operasyonan zêde dike û bi operasyonan ve PKK'ê tahrîk dike. Ayşe Hur bilêv kir ku AKP kurdên ku li gorî xwe wekî 'kurdên nebaş' ango kurdên polîtîk tasfiye dike... *RÛPEL - 4*

# Xebatên hevpar dê bidomînin




Jinên beşdarî Konferansa Jinên Kurd bûn bal kişandin ser girîngiya konferansê û diyar kirin ku platformên bi vî awayî di warê pêşvebirina yekitiya jinan de girîng e. Jinan anîn ziman ku divê ji bo hevparbûn û yekitiyê xebat bidomin. Helbestvan û nivîskara rojnameya me Hêvî Berwarî ku ji bo beşdariya Konferansa Jinên Kurd hatibû Amedê, der barê pirsgirêkên çand û ziman de axivî û da zanîn ku ziman hêştên neteweyî li mirovan bi pêş dixe... *R.7*

# Kurd û qonaxa nû

Kurd, nûnertiya aştî û demokrasiyê dikin, tirk nûnertiya şer û dagirkeriyê dikin. Du hişmendî û armancên ji hev cuda. Di mitolojiyê de, nûnerên şer û kuştinê, dek û dolaban Ulîs û Aşîl in... Tirk jî, nûnertiya wan dikin. Ulîs, hîlê, dek û dolaban temsîl dike... Aşîl jî şer temsîl dike... Tirkan, ji mirovahiyê tevan cuda, bi dengê "bikuje" de daye...

*Nivîsa Medenî FERHO R.2*



Medenî Ferho
medeniferho@hotmail.com

# Kurd û qonaxa nû

Kurd, nûnertiya aştî û demokrasiyê dikin, tirk nûnertiya şer û dagirkeriyê dikin.

Du hişmendi û armancên ji hev cuda.

Di mitolojiyê de, nûnerên şer û kuştinê, dek û dolaban Ulîs û Aşîl in... Tirk jî, nûnertiya wan dikin. Ulîs, hîlê, dek û dolaban temsîl dike... Aşîl jî şer temsîl dike... Xwedayê tirkan, fermana yekemîn, ji mirovahiyê tevan cuda, bi dengê "bikuje" de daye... Pêxemberê tirkan, şîreta nijadperestiya kujerî kiriye...

Di van rojên ku kurdan, şagirtîtiya aştiya li Tirkiyeyê û sazkariya demokrasiya li Tirkiyeyê girtiye ser milên xwe; di nîqaşên rewîzekirina Destûra Bingehîn de, li parlamenê qîr û qiyamet radibe.

Balkêş e ku, parlamenterên BDP'ê jî, siyaseta klasîk a li Tirkiyeyê erê kirine û bersivê didine her gotina desthilatdaran. Ev jî miştixulandin e...

Gelo, armanca desthilatdariya AKP'ê, bi rewîzekirina Destûra Bingehîn, kar û xebatên sûdewar yên ji bo guhertina Tirkiyeyê ne, yan ji bo guhertina rojevê ne?

Guman dikim ku, dîmenê li ser sînorê başûrê Kurdistanê û çerq û berka dîplomasiya li Enqereyê, ku SÊALÎ, hevkariya xwe ya li dijî Hereketa Azadiya Kurd, ji raya giştî re deklere dikin, tenê bi şerê psîkolojîk nayê navkirin.

Dibe ku koalisyona sêalî, bibe çaralî jî....

Bê çawa di menfaetan de, edalet çênabe; di têkiliyên dewletan de jî, dostanî, exlaq û soz çênabe... Di koalîsyona li dijî Hereketa Azadiya Kurd de jî, di heman çarçoveyê de gav têne avêtin. Bila kes bendeyî peyman, exlaq, rêbaz, hiqûq, edaletê nemîne.

Parvekirina sêyemîn ya cîhanê, ku wek "sohra globalîzmê" tê binavkirin, di edalet, dostanî, exlaq û sozê de teqinî be jî, di mijara kurdan de, li ser 'xewrebez'ê xwe ye. Li Balkanan şerekî di bin cilê de heye... Li Xezarê şerekî aşkera tê meşandin û Îranê, bi manewraya deryayî, bosta xwe li ser masê radike û dibêje Amerîka, "ev quloçê te"....

Amerîka jî, bi devê serokê hevpara petrolê ya herî mezin ya Ewropa TOTAL, got: "Eger ambargoya benzînê li ser Îranê bê danîn, em warîlek benzîn jî nafiroşîn Îranê."

Mîratzadeyê Sedam Îyad Alawî jî, li Enqereyê ye û şerê li dijî Hereketa Azadiya Kurd îlan kir. Lê, di dema ku Îyad Alawî, bi Wezîrê Karên Derve Ahmet Davudoglu re, li pêşberî rojnamevanan diaxivî, sertîfîkaya 2 parlamenterên wî, ji sedema kiryarên wan yên di dema Sedam û BAAS'ê de, hatin betalkirin. Yanî, mîrateya Sedam û Baas, li Iraqê, bi desteka Tirkiyeyê, hebûna xwe diparêze. Ergenekona tirk bi Ergenekona ereb re, JÎTEMA Tirk bi JÎTEMA Ereb re hevkariyê dikin.

Hêvî ew e ku hêzên Başûrî, nekevin nava vê gelefeka kujeriya li dijî kurdan.

Di nava vê xerc û mercê de, MHP gavên balkêş avêtin. Serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî, efûya zarokên di girtîgehê de xwest û şewrexiyê kevin yê ulkucuyan jî, çû serdana Ahmet Turk.

Aliyekî me fîşek e, aliyê din barûd e…

Mirov nikare li hemberî van pêşketinan, li hemberî van xirûcirê, hereketeke ADÎL hêvî bike. Hêviyeke li ser tayê ŞAKÛLÊ ye û ha ket ha ket e… Menfaetên rêxistinkirî, mirov dixapînin. Ji ber ku di kiryar û beşûşiya manfaetên rêxistinîkirî de, tenê rûdêna pêş ya neynikê xuya dike. Pişta neynikê, yanî fûlyona pişta neynikê, wek beroşa li ser agir dikelê ye.

Îdealîzm, gelek caran mala mirov xera dike.

Hêvî dikim ku BDP di îdeala azadiya kesayetî de nexire, yanî şaş nebe. Ji ber ku rewşa îro, zêde zêde metirsînî ye. Hêzên Artêşa Tirk, parlamenterîzma bi wesayet jî cidî nagire. Amerîka jî, ji sedema tevliheviya li Xezarê, ha ha Tirkiyeyê diajoyê û Tirkiye jî, ha ha êrîşî kurdan dike.

Li Enqereyê koalisyona li dijî Hereketa Azadiya Kurd hate avakirin. Lê ew baş e ku Iraq ne xwedî desthilatdariyeke rêkûpêk e. Hilbijartinên 7'ê Adarê jî, kete nava gelcê. Eger desthilatdariya Bexdayê sazkar bibe, SÊALÎ, bibin ÇARALÎ û hêzên Artêşa Tirk, operasyoneke derîsînor de destek bikin.

Piştî hilbijartinên Kibrisê ku Ergenekona Spî serketin bidestxist, AKP'ê û Ergenekona Kesk, kete nava tevgerê. Ergenekona Kesk, berê xwe daye kurdan. Baş tê zanîn ku dema dagirkerên Kurdistanê dikevine nava tengasiyan, wek qurban kurdan hildibijêrin û wek BIZINA NOJEK, ji çar aliyan ve, li nav serûguhên kurdan didin.

Dêhnê xwe bidin Îranê, ji bo ku Tirkiyeyê, bi kar bîne, kurdan dike qurban. Yanî civanê çûkan, li nava GARISÊ MEMA ye.

Îcar, zanista siyasî, her dem aliyê 'fanî' yê civakan destnîşan nake. Lewma dibêjin siyaset bi tesadûfan û xwezî nayê meşandin. Em li cîhana ku ALAVÊ DÎROKÊ ŞÛRe dijîn.

Ew guhertina siyaseta kurd ku min di destpêkê de got, di çaremîn heyama Hereketa Azadiya Kurd de, hîna ji aliyê BDP'ê ve baş nehatiye fêmkirin. Ji ber ku parlamenterên BDP'ê li devê rayedarên AKP'ê dinêrin. Lê balkêş e ku dewleta Bahçelî û MHP gav avêtin. Lewma, dilê min zêde lêdide.

Min di êrîşa li dijî Kekê Ahmet Turk de, got ku, tê xwestin ku pêvajoya Hrant Dînk bidin destpêkirin. Ez hîna wê gotina xwe diparêzim. Hrant Dînk, çavtirsandina Sarkîsyan bû… Êrîşa li dijî Kekê Ahmet Turk jî, pêvajoyeke wiha ye… Gelo çi bû ku Dewlet Bahçelî, şelîta darvekirinê ji destên xwe danî?

Ji hilbijartinan û vir ve, tiştê ku li Tirkiyeyê hatiye guhertin, hêza polîsên taybet ku di dewsa JÎTEM û kontra de hatine bicihkirin e.





# Ahmet Turk û Qala Yekitiyê

## Gelê kurd, zanebûn û têgihiştina xwe ya siyasî, gihandiye vê astê ku, ew bi vê yek ê, kîjan rêbazê dikarê azadiya xwe bistînê

HARÛN SERDAR*

Ahmet Turk rûspiyek civata kurdan e. Gelê kurd wî bi welatparêzî, têkoşerî û wêrekiya wî dinasin. Bêguman dijmin bi leyistokên cuda xwest, wî ji wî dûr bixînin. Bi ser neketin. Ew her di riya xwe de, bi aramî dimeşe. Ev kiryara qirêj, ku genî bûye, bikar anîn.

Ahmet Turk deriyek bû di kela Kurdistanê de, şikestina wi, dibû destkeftiya dijmin. Berxwedana wî, ji bo dijmin têkçûn bû. Ji ber vê yekê jî xwestin vîna wî û civatê bi vî awayî bişkênin. Ev rêbaz tê nasîn, vê rêbazê ji mamosteyên xwe gladyoyê hîn bûne. Di dema xwe de, li hemberî Mesût Yilmaz û serokê italyanî Berlusconi ji, bikaranîn. dixwazin bêjin 'em li ber pozê te ne'. Wan ji xwe re bi vî awayî got. Dor hatibû civata kurd. Guman nîne gelê kurd jî, bi bersivdayîna xwe, dijmin tevizand. Eger berxwedana bi vî rengî, weke pêleke hilnebûya, payedar û rayedarên hikûmeta tirk, nediçûne serlêdana Ahmet Turk. Ji ber ku ew bi xwe bersûc in. Ji roja ku sîxûrên wan li Kopê her dû kurd, kuştin û heta niha hemû tiştê wan, bi plansazî dimeşe. Naxwe çi karê dadgehê heye li wî bajarî? Nîqaş ne li ser dewlet û hikûmeta tirk e. Ka ev bûyer ji hêla wan ve tê zanîn an na? Ev tiştekî leşkeriyê ye.

Lê belê encamên ku piştî vê bûyerê rû dane, hêjayî lêkolîn û nirxandinê ye. 'Av heta germ nebe nakele', berxwedana ku gelê me li seranserî Kurdistanê û cihên ku lê dijî, nîşan daye, dîsa şanaziyeke civata kurd bi xwe ye. Pir watedar e, civata kurd, di encama têkoşîna azadiyê de, êdî têgihiştina nirxên civatî û exlaqî, her wiha ji, siyaseta xwe parastinê, baş serwext bûye. Xala bingehîn û bi rûmet ev yeka hanê ye. Dîsa, ji encamên vê, xaleke girîng jî ew e ku li başûrê Kurdistanê, gelê Duhokê bi meşa xwe, dengê xwe bilind kir, ligel Bakur û ji hêla xwe ve peyama vê serdemê dan. Jixwe carna hin bûyer, dibin sedemên pêkhatina armancên mezin. Neteweya Kurd a demokratik, bi helwesta xwe ya serbilind, peyamên kûr dide derdorê.

Gelê kurd, zanebûn û têgihiştina xwe ya siyasî, gihandiye vê astê ku, ew bi vê yek ê, kîjan rêbazê dikarê azadiya xwe bistînê. Her wiha wê dijminên neteweya kurd, baş bizanibin ku, haveynê ku tevgera azadî, meyandiye, xwedî avabûneke wiha ye, her êrîşa bê ser bi berxwedanên pêl bi pêl, wan pêşwazî dikê û bêalî dike. Ez bawerim di vê berxwedanê de, bi sedan ciwanan berê xwe dane çiyan. Careke din vekirî xuya bû ku, neteweya kurd, bi hêza xwe bi xwe, dikare azadiya mayînde ji bo xwe bînê. Mînak; ev gelê ku ji bo vê bûyerê, rabû ser piyan, ger bê xwestin, du caran wê bi çek, dikare xwe ber bi kolanan bide! Ma gelo di rewşeke wiha de, wê çi bibê? Her kes divê bifikirê. Ha ji were alternatîfek! Peyamên herî girîng yek jî, ew e ku, mijara yekitiya gelê kurd e. Ev berxwedan destpêka serdemeke nû ye. Ev serhildan di vê dema ku konferansa neteweyî di rojevê de ye pêk hat, xwedî pratîkeke giranbuha ye. Ango pêşengî ji civata demokratîk hat. ji dirûşmeyên meşa Duhokê ji, diyar bû, gelê kurd, pêwîstî, lezgînî û demhatina konferansa neteweyî baş dibînê. Her wiha ev berxwedan, ger baş were şîrovekirin bû destpêkirina vê konferansê. Neteweya kurd a demokratîk, gava pêşîn avêt. Niha dor ya saziyan e. Civîna duyemîn a xwedî biryar li benda partiyan e.

** Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê*

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mehdi TANRIKULU

*Yönetim Yerî:*
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
*İdare Tel:* 0 (412) 251 38 88
*Yayın (Weşan)*
*TEL:* 0 (412) 237 48 90-91
*Fax:* 0 (412) 237 48 89
Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Edene:* Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
*No:* 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

# XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Dijberê rengî spî... Kurtebêja Antîmonê... Rêxistina polîsan a naziyan **2.** Heta hetayê... Dijbera jor **3.** Cure, celeb... Nexweşiyek **4.** Kurteya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê... Notayek **5.** Kurtebêja Zîvê... Bajarekî me **6.** Paytexta Misrê... Notayek **7.** Beyreq, sembola welatan **8.** Teref... Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov an jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê tê gotin) **9.** Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Bêyom... Cejn, eyd

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Notayek... Kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne **2.** Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Dewara nêr... Agir **3.** Çengela ku pê masî tê girtin... Pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê didê **4.** Zimanê gelê Danîmarkayê... Kar û xebat **5.** Notayek... Yezdanekî misrî **6.** Pênûs **7.** Kulîlka ziqûmê... Bi soranî 'av' **8.** Hejmarek...Genimê hêrandî... Pirsek di rewşa ne tewandî de **9.** Plakaya navneteweyî ya Sûriyeyê... Rengek

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | X | W | E | S | E | R | ■ | T | A |
| 2 | W | ■ | Z | Î | N | ■ | L | E | M |
| 3 | E | S | A | ■ | Î | S | A | ■ | Û |
| 4 | ■ | A | N | F | ■ | Ê | V | A | R |
| 5 | X | W | ■ | I | R | ■ | A | W | ■ |
| 6 | A | ■ | A | R | A | F | ■ | A | D |
| 7 | L | O | R | Î | ■ | A | A | ■ | E |
| 8 | ■ | L | ■ | K | Ê | ■ | E | M | R |
| 9 | S | E | K | ■ | M | Û | ■ | Î | Z |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 2 | | | | | | ■ | | | |
| 3 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 6 | | | | | | | ■ | | |
| 7 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | ■ |
| 9 | | | ■ | | | | ■ | | |

www.arsivakurdi.org

# Demîrtaş: Ev şer nîn e çi ye?

**Hevserokê BDP'ê Demîrtaş, bertek nîşanî helwesta Serokê Parlamentoyê Şahîn da û got: '50 hezar hatin kuştin. 3 hezar gund hatin şewidantin. 17 hezar kirinên faîlên ne diyar hene. Ev ne şer e, çi ye?'**



Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, di civîna Koma BDP'ê de axivî û gotina Serokwezîr a "Zêde mezin nekin" ku ji bo bûyerên tecawizê yên li Sêrtê pêk hatî bi kar anî anîbû rexne kir û xwest Serokwezîr Recep Tayyip Erdogan ji gelê Sêrtê lêborînê bixwaze. Demîrtaş, diyar kir ku gelê kurd û zarokên kurd ne bêxwedî ne û wiha got: "Ev gel bi parastina xwe ya rewa, xwe diparêze. Divê Serokwezîr biçe Sêrtê û ji gelê Sêrtê lêborîna xwe bixwaze." Demîrtaş, bang li karkeran kir û xwest 1'ê Gulanê bi ruhê Newrozê pîroz bikin.

Demîrtaş, di serî de bal kişand ser operasyona li dijî siyasetmedarên kurd û BDP'ê û wiha got: "Hêj nêzî hezar û 500 siyasetmedarên kurd girtî ne û operasyon didome. Herî dawiyê li Qersê 7 siyasetmedarên din hatin girtin. Serokê Rêxistina BDP'a Agirî yê Halîl Aksoy hate girtin. Serokên rêxistina partiya siyasî ji ber axaftina xwe rastî cezayên giran tên û tên girtin. Heke ku operasyon û komkujiya siyasî ji ser partiya me kêm nebe dê Hikûmeta AKP'ê di bin vê yekê de bimîne."

**Serokwezîr çi dibêje?**

Demîrtaş di axaftina xwe de cihek mezin da bûyer tacîz û destdirêjiyê ya li Sêrtê û wiha pê de çû: "Mirov nikare ku bi gotinan bîne ziman. Ev ne sûcê wan e. Veşartina vê bûyerê dê tenê zirarê bide sêrtiyan. Her ku tiştên bi vî rengî derkevin holê, dê pêşeroja me birûmetir bibe.

Demîrtaş, got ku ev hemû tişt parçeyên pergala qirêj in û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Li Tirkiyeyê her sal bi hezaran bûyerên bi vî rengî pêk tên. Divê dewlet jî ji bo ronîkirina vê yekê bikeve nav hin hewldanan. Lê dewlet wiha nake. Li gel ku vê yekê nake, li ser rêxistin û saziyên ku dixwazin vî karî bikin jî zextên mezin dike. Serokwezîr û Wezîra Perwerdehiya Neteweyî dibêjin ku divê ev bûyer zêde neyê mezinkirin. Lê ev bûyereke gelek mezin e. Ev, bûyereke ku dê li Tirkiyeyê qiyametê rake. Divê sorokwezîr jî êdî çapemeniyê sûcdar neke. Divê biçe ji gel lêborîna xwe bixwaze. Divê walî û midûrê polîsan ji peywirê bigire. Divê serokwezîr vê bûyerê mezin bike."

**Tecawîzkar nayên efûkirin**

Demîrtaş da zanîn ku ew li vir behsa çeteyeke tecawizê ya ku di nav de esnaf û polîs jî hene dikin û wiha pê de çû: "Heke ku hûnê vê mijarê mezin nekin, hûn dê çi mezin bikin? Heke ku ev ne girîng be, çi girîng e? Dibêjin ku ew ê der barê pirsgirêkên zarokan de hin tiştan bikin. Wê demê bila ji bûyera Sêrtê dest pê bikin. Divê ku biçe Sêrtê û ji gel lêborîna xwe bixwaze. Heke baweriya wan bi demokrasiyê hebe, heke ew dixwazin makezagoneke demokratîk amade bikin, bila berê xwe Sêrtê û ji wir dest pê bikin. Hêsan e ku derkeve çapemeniyê û çapemeniyê sûcdar bike. Ev du sal in ku ev tiştên qirêj pêk tên lê waliyê Sêrtê jî dixwaze ev bûyer neyê mezinkirin. Lê em ê vê bûyerê mezin bikin. Em dê hesabê vê yekê ji we bipirsin. Di be ku ev tişt li kursiya meclîsê de neyên ditîn. Lê, Birêz Serok dema ku li Colemêrg û Şirnexê bera xwe didinê ve baş tê dîtin. Di be ku tu nebînî lê tu dê çawa ji 50 hezar dayîkên evlatên xwe di vê şerî de winda kirî vebêjî. Di xwazin bêjin şer tuneye da ku aştiyê jî pêk neyîn. Raman şer qebul neke dê çawa aştiyê qebul bike. Ramana bi vî şeklî di serokatiya Meclîsê de xwe aniye ziman raman AKP'ê jî aşkera kiriye. Serokêkî Meclîsê yê difikire ku tenê şer di navbera du dewletan pêk tê heye. Nêzîkahiya Serokê Meclîs, heman demê de nêzîkahiya AKP'ê ye. Peyvên aştî û şer bi hevre Serokwezîr bikaranîbû. Fermandar ji bo wan bûyeran tabîra şerê neşidiyayî bi kar anîbû. Serokê Meclîsê bi vê yekê nerihetbûye û helwesta xwe ya nijastperst nîşandaye. Ji bo vê yekê 500 mîlyar dolar bikar aniye û bêkêrhatî li ber çavan negirtiye. Heke şer tunebe, we heron jî bo çi jî Israîl û Almanyayê kirine? Heke şer tunebe çima bûtçeya şer 2 katan ji bûtçeya Egîtîmê zêdetir e. Heke li Tirkiyeyê şer tunebe çima Fermandar hine li ser siyasetê bihêz e. Heke şer tunebe çima bi 10 hezaran însan li çiyayan in, 10 hezaran di zindanan dane û bi 10 hezaran di operasyona dane? Kesên di bêjin di vî welatî de şer tuneye bila van hemûyan li ber çavan bigirin. Heke şer tunebe hûnê çi çareser bikin. Hûnê rondikên dayikan çawa bidin seknandin û dê çawa aştiyê pêk bînin.

**'Vê yekê neynin bîra xwe'**

Demîrtaş, destnîşan kir ku di bûyera li Sêrtê hate jiyîn de û carekê din derket holê ku divê li ser têgeha zilam a serdest û pergala perwerdehiyê bê sekinandin, ji ber ku pergal ji vê yekê re vekiriye. Demîrtaş, anî ziman ku hekûmet û makeqanûna vê pergalê zarokan naparêze.

Demîrtaş, diyar ki ku zarokên kurdan bêxwedî nîn in û wiha axivî: "Me ev zarok li erdê nedîtine. Ev zarok û jin perçeyên vî gelî ne. Ev gel dikare bi parastina xwe ya cewherî hebûna xwe biparêze. Têkildarî YÎBO'yê jî hevalên me li Meclîsê pirsgirêk anîne ziman. Beriya ev bûyer derkevin holê pêşniyarpirsa me ji aliyê AKP vê bi dengdayînê hate redkirin. Pergala perwerdehiyê di serî de têgeha serdest a li Tirkiyeyê divê bê pirsiyarkirin. Kampanyayên hevalên me yên jin li hemberî vê yekê bimeşînin em jî dê piştgiriyê bidinê. Nêzîkatiya li hemberî gelê Sêrtê rast nîne, lazime bê zanîn ku pirsgirêk a gelê Sêrtê nîne."

**'Herin Colemêrg û Şirnexê'**

Demîrtaş, bakişand ser nîqaşên derbarê guhertina makeqanûnê û da zanîn ku divê ji bo nîqaşan qadên azad hebin û nerazîbûn nişanî dimênên şîdetê yên li Meclîsê diqewimin da. Demîrtaş wiha dirêjayî da axaftina xwe: "Lazime hemû kes nêrînên xwe bînin ziman û tu carî rastî tu astengiyan neyên. Hevalên me timî perspektîfên xwe bi zimanekî baş tînin ziman û divê sekna wan ji bo kesên din jî bibe mînak."

Demîrtaş, nerazîbûn nîşanî helwesta Serokê Meclîsê ya li hemberî axaftina Sebahat Tuncel a der barê pênaseya "şer" û da zanîn ku helwestek nedemokratîk hatiye nîşandin û "dema parlementerek nêrînên xwe bîne ziman neçar nîn e ku wekî serokê meclîsê bifikre û li gorî wî tevbigere. Ma hemû kes neçar li hemberî serokê meclîsê bîat bin?". Demîrtaş, desnîşan kir ku wekî BDP'ê şerê ev 30 sal in didome wekî şer binav dikin û got ên dibêijn şer nîn e têkildarî Serokê Meclîsê û parlementerên AKP'î wiha dom kir: "Ev 3 sal in li wir fermandariya hêzên hewayî, Artêşa 3'yemîn û bi beşdariya 70 hezar cerdevan ma şerek nayê meşandin? Ma vî welatî 50 hezar ciwanê xwe windanekirine? Ma hîna ev yek dom nake? 3 hezar gund nehatin valakirin? Ma 2 mîlyon û nîv kesên hatine binçavkirin û di îşkenceyan de nehatin derbaskirin."

**Şertê piştgirî dayînê**

Demîrtaş, bal kişand ser guhertinên makezagonê û da zanîn ku di helwesata wan de tu guherîn pêk nehatine û wiha pêde çû: "Em partiya ku ne TCK û TMK'ê, en bendava hilbijartinê û demokratîbûnê neke piştgiriyê nadenê û ev yekê karê me jî nîn e." Demîrtaş, diyar kir ku di vê mijarê de dê muxalefeta heta makezagonekî nû çêdikin dê bidomînin.

Demîrtaş, balkişand ser e-muxturaya 27'ê Nîsanê û nerazîbûnên xwe yên wê demê bîranî. Demîrtaş, di axaftina xwe de got ku xalên maqezagonê yên der barê darizandina darbekaran de ku tê xwestin bê guhertin jî ne bi hêvî ye û wiha got: "Serokwezîr di got em ji ber e-muxtirayê maxdûr in. Pekî, xwediyê muxtirayê niha li ku ye? Ew niha bi wesayîta bi zirh ku AKP jê re standiya, digere. Heman Serokwezîr, bi wî generalî re li Dolmabahçeyê protokolên xef îmze kirin. Van generalan digotin, 'yên xwe weki tirk nahesibînin dijmin in". Gelo Serokwezîr niha bi parastina wan generalan, gotinên van jî diparêze." Demîrtaş, got ku di 23'yê mehê de zarokên maxdûrên TMK'ê xwestine bên serdana wan, lê li Pozantiyê ji aliyê polîsan ve hatine binçavkirin.Pêşiyê em li ser TMK û TCK'ê hin guhertinan pêk bînin. **(ENQERE / DÎHA)**

## Ji bo Sêrtê qedexeya weşanê

Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK), bi biryara Dadgeha Sulh Cezayê ya Sêrtê, têkildarî bûyera tecawizê ya li Sêrtê biryara qedexeya wêşanê da.

RTUK'ê bi daxuyaniyekê nivîskî diyar kir ku têkildarî bûyera tecawizê ya li Sêrtê bi biryara Dadgeha Sulh Cezayê ya Sêrtê, biryara qedexeya wêşanê daye. RTUK'ê da zanîn ku Dadgeha Sulh Cezayê ya Sêrtê gotiye ku di çarçoveya lêkolîna derbarê "Îstismara zayendî" têkildarî tesbîtkirina gumanbaran lêkolîn tê meşandin. Lê di vê navberê de çapamenî û weşanên tên kirin nav û pîşeyên kesên gumanbar ku hîna cezakirina wan nediyar e ji ber derbarê wan de lêkolîn tê kirin hatiye qedexekirin. **ENQERE**

## Girtinên li Qersê şermezar kirin

Girtina 7 rêveberên DTP'a hatiye girtin, BDP'ê û Egîtîm Sen'ê li Qersê, bi daxuyaniyeke girseyî hate şermezarkirin.

Di 23'yê nisanê de di encama serdagirtina malan de Serokê Rêxistina BDP'ê yê Navenda Navçeyê Îbrahîm Boşnak, rêveberên BDP'ê Ramazan Erkmen, Erdal Înce, Musa Çakmak û Nurettîn Çelendîr, Rêveberê DTP'a hate girtin Kadîr Dag û Serokê Şaxa Egîtîm Sen'ê yê berê Tuncer Uşar hatibûn binçavkirin û pişt re jî hatibûn girtin. Li hemberî van girtinan li Qersê daxuyaniyeke çapemeniyê ya girseyî hate dayîn. Girseya li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Qersê hatiye cem hev di nav de Şaredarê Dagpinarê Ayhan Erkmen, Şaredara Qaqizmanê Çîgdem Ozlu, Cîgirê Şaredarê Têkorê Yaşar Budak heyî heta Kolana Faîk Bey meşiyan. Di meşê de slogana "Zext me bêzar nakin" Li ser navê komê Alîkarê Serokê Rêxistina BDP'ê ya Qersê Îdrîs Agbaba, daxuyanî xwned. Agbaba, diyar kir ku li ser saziyên kurdan ên Qersê gelek zext hene û diyar kir ku ew ê li hemberî van zextan bêdeng namînin. **QERS**



Adil Zozanî
adilzozani@gmail.com

## Tifaqên nû pêwîst in

Em ketin ber atmosfera hilbijartinê. Her kes êdî peyamên xwe li gorî hilbijartinê dide. Ji ber hindê jî partiyên siyasî di perdeya herî bilind de diaxivin.

Di van rojên ku pakêta ji bo guhertinên di Makeqanûnê de tên dabaşekirin û dengdan de, partiyên siyasî yên komên wan di parlamentoyê de heyî ligel dabaşeyên li ser guhertinên di Makeqanûnê de kemînan jî li ber hev datînin.

AKP, dikarê danîna kemînan baş pêk tîne. Dê propagandaya xwe hilbijartinê li ser esasê van guhertinan û 'berlêvekirina pirsgirêka kurd' bihone. Xeta CHP û MHP'ê diyar e. Ew dixwazin şer û tengezarî zêde bibe. Çiqas cenaze bên ji bo wan ew qas 'baş' e. Ew ê xeta xwe ya nîjadperest di perdeya herî bilind de bikarbînin. BDP dê çi bike? Dê li ser kîjan bingehan siyasetê bimeşîne? Bersiva vê pirsê, divê zelal be. Lewre tabloya BDP û AKP'ê dê li ser bikevin rikberiyê beriya hilbijartinên 2007'ê tîne bîra mirov. Tablo dişibin hev. Mimkûn e ku her du partî jî li bakurê Kurdistanê qala heman tiştî bikin. AKP'î dê vê bêjin: Ji ber Ergenekoniyan me karî ji bo pirsgirêka kurd gavan bavêjin. Me di dema borî de ergenekonî tasfiye kirin niha jî dor hatiye 'çareserkirina' pirsgirêka kurd.

Dê bi kurdî baxivin, dê qala maf û azadiyên gelê kurd bikin…

BDP jî dê hewl bide ku durûtiyên AKP'ê deyne holê. Heke bikaribe xeta 2009'ê bibe serî, AKP li bakurê Kurdistanê ji bo gotinên xwe bingehekî nabîne. Lê divê di vî warî de hewldanên bi zanebûn pêk bên. Di vê pêvajoyê de dabaşeyên ji bo tifaqan jî dê bêne rojevê. BDP, divê ji cerebeyên dema borî sûdê bigire û nexşeriyekê dane ber xwe.

Beriya her tiştî, tifaqên dema borî ji bo siyaseta kurd ne bûne bingehê serkeftinê. Siyaseta kurd xeleka xwe û ya rojavayê Tirkiyeyê nexiste nava hev. Ji ber hindê jî divê, vê carê riyeke nû biceribîne.

Belê, nabe ku BDP yên heta îro bi siyaseta kurd re meşiyan e, deralî bihêle. Hêzên çepgir û demokrat tifaqdarên siyaseta kurd in. Sedem çibe bila bibe, nabe ku ew derî guftugoyên tifaqê bêne hiştin.

Lê rastiyeke din jî heye. Ji 99'ê hate niha 5 hilbijartin derbas bûn. Di tevan de jî yek kêm yek zêde bi hemû hêzên çepgir û demokrat re tifaq hebû. Dengên hatine girtin li holê ne. Ji bo serkeftineke ku dihate xwestin têrî nekirin.

Pêr şîrketa anketor SONAR'ê encamên anketeke di meha nîsanê de pêk anî aşkerakirin. Rêjeya dengên BDP'ê balkêş e: Ji sedî 6.71… Ev yek ji rêjeyên herî bilind a anketên şîrketên tirk a ji bo dengên partiyên siyasî yên kurd e. BDP bêyî ku dabaşeya tifaqan bê kirin, xwedî tobleyeke wisa ye. Lê dema dabaşe ji bo tifaqên teng û marjînal tên kirin, ev rêje dadikeve.

Siyaseta kurd ji kurdistaniyên li welatê xwe niştecihin deng girtin, lê ji kurdistaniyên koçberî deng negirtin. Kurdistaniyên koçber reflekseke muhafazakar nîşan didin û dûrî hêzên çeggir radiwestin. Dewlet jî di vî warî de dek û dolaban digêrîne. Bendan datîne navbera kurdistaniyên koçber û siyaseta kurd. Di her dewrê de partiyeke ku wekî Hespê Truvayê hatiye bikaranîn peyde bûye. Vê dewrê jî AKP vê rolê dilîze. Û siyaseta kurd, heta niha nekariye vê paradoksê serobin bike.

Hilbijartinên 2011'ê di vî warî de derfeteke nû dide ber siyaseta kurd. Di rewşa heyî de borandina benda ji sedî 10 ne mimkûn e. Û dema hesap li ser 'namzetên serbixwe' bên kirin, encam ji niha ve diyar e. Ji ber hindê divê siyaseta kurd hûr û kûr fikire. Li gorî min mimkûn e ku siyaseta kurd lûleya tifinga dewletê li dewletê bizivirîne. Ev jî bi berfirehkirina sîwaneyê ji bo tifaqan mimkûn e. Tevlikirina Partiya Saadetê (SP) ya ji bo bin sîwaneyê hêja ye ku bê dabaşekirin.

# Li Belçîkayê şerê azadî û netewe-dewletê

**Belçîka bi demokrasiya xwe ya berfire dihat nasîn. Ancax ne valonî û ne jî flamanî ji vê razîne. Di encama lêkolînê de derket holê ku valonî dixwazin pergala netewe-dewletê bê xurtkirin û flamanî jî piştgirî didin xurtkirina serxwebûnê**



Li Belçîka yê piştî qeyrana hikûmetê, di lêkolîna rayagiştî de derket holê ku, flaman serxwebûnê û hîn bêhtir otonomiyê dixwazin, valon jî, nêrîna xwe di derbarê dewleta unîter de dan diyarkirin.

Ligorî lêkolîna televîzyona RTL'ê ya ku li ser 1500 kesan pêkanîye, flamanên ku ji sedê 50 şêniya Belçîkayê pêktînin lê dahata ji sedî 60'ê bêhtir werdigirin, dixwazin dahata xwe bi valonên bi fransî di axivîn re par ve bikin.

**Flaman got serxwebûn**

Ji sedî 16`ê civaka flamanan Bruksel jî girtin cem xwe û daxwaza serxwebûnê kirin. Ji sedî 17`ê wan jî alîgirin konfederasyonên cudane.

Ligorî lêkolînê, ji sedê 24`ê flamanan daxwaza hîn bêhtir otonomî yê ji herêmên federe re kirin, yên ku berdewamkirina rewşa heyî dixwazin, ji sedê 14 ne û kesên ku alîgirên kêmkirina payeyên herêmanin jî, ji sedê 10 in.

**Valon dewletparêziyê dikin**

Valon bi çavek sar li serxwebûnê meyzedikin. Li gorî lêkolînê ji sedê 32`ê valonan dixwazin payeyên herêman bên kêm kirin û Belçîka bibe dewleteke bihêz ya unîter. valonên ku dixwazin rewşa heyî berdewam bike, ji sedê 24'an de dimînin.

Di nava valonan de kesên ku dixwazin ji herêman re bêhtir otonomî bê dayîn, ji sedê 14 ne. Yen ku destekê didin konfederasyonan jî di rêjeyek ji sedê 9`an de man. Yên ku jî bo Belçîkayê serxwebûneke tekuz dixwazin ji sedî 1 in. BRUKSEL

# Destbirayê Erdogan ê tevkujer bi ser ket

Li Sûdanê piştî 24 salan yekemîn care hilbijartina ku gelek partî beşdar dibin pêk hat û di encama vê hilbijartinê de cereke din El Beşîr bi ser ket û bû serokomarê Sûdanê.

Çavdêr berya ku encam bê aşkerakirin li bendê bûn ku Serokomarê Sûdanê Omer El Beşîr ferqeke mezin bidest bixe û carek din bibe serokomar.

Salva Kîîr jî li başûrê Sûdanê bi ser ket û serokatiya başûrê Sûdanê bi dest xist. Salva Kîîr berê lîderiya xwepêşandêran dikir.

Serokê Komîsyona Hilbijartina Neteweyî Abel Aliye aşkera kir ku Omer Hesen Ehmet El Beşîr û partiya wî Kongreya Neteweyî ji sedî 68 ê dengan bi dest xist û bi ser ket.

Li gor daxuyaniya Aliye Salva Kîîr jî ji sedî 92,99'ê dengan ê başûrê Sûdanê bi dest xist.

Kîîr bi vê serketinê hem dê cîgiriya serokomariya Sûdanê bike û hem jî di nav hikûmeta koalîsyona başûr-bakurê Sûdanê de bi mîsyoneke taybet de cih bigire.

**El Beşîrê sûcdar e, divê bê girtin**

Hat gotin ku di hilbijartinên her du aliyên Sûdanê de jî nelirêtî pêk hatine. Çavdêrên Navneteweyî jî aşkera dikin ku krîterên hilbijartinê ne li gor standarda ne û hilbijartineke wisa naye qebulkirin.

Serokomarê Sûdanê El Beşîr ji aliyê Dadgeha Cezaya Navneteweyî ve ji ber sûcê şer sûcdar hatiyibû dîtin û derbarê wî de biryara girtinê derxistiye.

El Beşîr hilbijartinê bo ku pozîsyona xwe xurt bike dixwaze wek navgînek bikar bîne. Armanca El Beşîrî ev e ku pozîsyona xwe qaşo bi hilbijartineke demokratîk rewa bike. El Beşîr ji ber biryara Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî newêre biçe welateke din.

El Beşîr di qada navneteweyî de her diçe wek tevkuj sûcdarê şer teşhîr dibe. Balkêş e ku di rewşeke wisa de jî dostaniya El Beşîr û hikûmeta AKP'ê wek xwe ye. El Beşîr ligel ku der barê wê de biryara sûcê şer heye jî hatibû serdana Tirkiyeyê. HARTUM

# Ebas: Divê hevdîtinên aştiyê dest pê bikin

Israîl biryar da ku lêkirina malan û avahiyên din yên li Qudsa Bakur rawestînin. Ji bo vê hêzên navneteweyî zext li Israîlê dikir. Filistîniyan jî rawestandina lêkirina malan ji bo destpêka hevdîtinên aştiyê wek krîtera esasî qebul dikir.

Serokdewletê Filistînê Mehmûd Ebas jî piştî biryara Israîlê bi daxuyaniyek aşkera kir ku rêveberiya wan amadeye ku bi Israîlê re dest bi hevdîtinên ne rasterast bike.

Endamêm meclîsa şaredariya Qudsê diyar kirin ku wan ji ofîsa Serokwezîrê Israîlê Benyamîn Netanyahu fermana rawestandina lêkirina mal û avahiyên cihêreng ên Qudsa Bakur girtine.

Lê naye zanîn ku rawestandina lêkirina avahiyan ji bo demek e, ango bêdawî ye.

Ebas li ser mijarê daxuyanî da Kanala 2 ya televîzyona Israîlê. Di daxuyaniyê de da zanî ku ew dê pêşniyara Amerîkayê ya ne rasterast bibe civîna yekitiya ereban. Civîn di hefteya pêşiya me de dest pê dike. Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama jî diyar kir ku heta ew serokdewlet be dev ji hevdîtina aştiya Israîl û Filistînê ber nade. Serokdewletê Amerîkayê yê berê George Bush jî gotibû heta dawiya desthilatdariya xwe ew dê dewleta Filistînê bide avakirin! QUDS


# SPASÎ



*Ji bo ku di hewariya bavê me rehmetî EHMED POLAT de ked dane û em bi tenê nehiştine, di serî de Şaredarê Bajarê Mezin Osman BAYDEMÎR, Şaredarê Bajarê Sûrê Selîm KURBANOGLU , Serokê BDP'a bajêr û navçeyên wê, serok û rêveberên kurdî-der û komeleya nivîskaran,hemû rêveber û xebatkarên DÎSKÎ, hemû xebatkarên tesîsa dawerivandina avê û hemû kesê ku ber dilê me dan û em ziyaret kirin re spasiyên xwe pêşkêş dikin.*

**Li ser navê malbata Polat**
**Edîp Polat**



LARA

Werin LARAyê cudahiyê bibînin

LARA navnîşana erzaniyê!
Cil û xemla malê
Cilên folklorîk
Cureyên cilên kurdewar
Û ji bo dawetan rûyên mase û sandalyeyan

Nîşe: Her wiha hemû cureyên cilan bi erzanî bi kirê tê dayîn
Navnîşan: Cengizler Cad No:14 Baglar - Amed
Tlf: 0 (412) 233 30 13 Gsm: 0 (539) 270 38 97







**Feleknas Uca**
Feleknasuca@web.de


## Jin, jiyan û azadî

Ez vê gavê li Amedê me û beşdarî konferansa jinen kurd a bi nave "Di peşvebirina demokrasiyê de rola jinê" bûm.

Konferans ji aliyê "Tevgera Jinên Azad û Demokratîk" hatîbû amadekirin.

130 delege ji Ewropayê û ji çar aliyê Kurdistanê wek mêvan, axaftvan û piştgir li konferansê amade bûbûn: Nûnerên Parlamena başûrê Kurdistanê, nûnerên kurd ên Parlemana Tirkiyeyê, ronakbîr, rojnamevan, hûnermend û hwd.

Bi nêrîna min cara yekem bû ku hev qas jinên pispor ji bo pirsgirêka jinên kurd û heremê beşdarî konferansê bûn.

Wek amadekaran, divê jin yekbin.

Her jinên amedekar ji bo bihêzbûna jinan axifiya.

Her jin rengêkî ji heremên Kurdistanê bûn.

Her jina pispor, pirsgirêkên jinan li çar aliyê Kurdistanê anîn ziman.

Piştgirî wek dozêkî bû nîşana konferansê.

Kariyerîzm nîn bû.

Jinêkê çave xwe berneda cihê jinêkî din.

Mijara şîdetê, vek mijara sereke ya konferansê di nav niqaşan de ket ser û dive ji bo vê pirsgirêkê çareserî û perspektîf bihata dîtîn.

Pirsên sereke yên konferansê ji aliyê axaftvanan nehat destnîşankirin:

Rola jinan di nav civaka kurd de çi ye?

Têkiliya cinsan di civaka kurd de çawa hatiye hunandin û kî ji vê tekiliyê feyde dibîne?

Mafê jinan di civakê de çi ne?

Jin çawa dikare mafê xwe bi dest bixe?

Bê jinan dikare demokrasî bi serbikeve an na?

Û jinên kurd divê di destpêka projeya azadbûnê de kijan gavan bavêje û stratejiyeke çawa biafirîne?

Bi min jinên ku di konferansê de mijarên zanistî amade kirin serkeftî bûn.

Xebatên hevbeş konferans kir platforma çalakiyên afirandinê.

Ramana konferansêkî neteweyî bû hêviyêkî nû ji bo beşdarên konferansê.

Ez hêvî dikim ku partiyên kurd jî bikaribin bigihîjin yekitiyêkî neteweyî.

Di encamê de her jinê ku beşdarê konferansê bû dikaribû ku bibejê: Em jin, me yekitiya xwe ava kir.

Hêviya min: Jin ji bo parastina xwe saziyan damezirînin, êdî tu jin nebe qurbanê şîdetê mêran.

Mijara :"Di pevajoyen têkoşîna demokratîk de rista jinan û di warê serkeftina zayenda civakî de perspektifen wan/ Di bidesxistina piştgiriya neteweyî ya demokratîk de rêbazen jinan/politikayên dewletê yen li ser înkar û redkirina nasnameya kurdan / pirsgirekên ku jinên kurd pêre rû bi rû ne û şiklên cûdahiyên piralî û perspektîfên jinen kurd en çareseriyê û rêbazên wan ên têkoşînê (parvekirina tecrubeyan)" wek mijarên balkêş a konferansê hewceyî niqaşeke berfireh bûn.

Ez dixwazim hefta din beşa dûyem li ser konferansê binivîsim.

# Dê xebatên hevpar bidomînin

Gulîstan AKSOY - AMED / DÎHA




Jinên beşdarî Konferansa Jinên Kurd bûn bal kişandin ser girîngiya konferansê û diyar kirin ku platformên bi vî awayî di warê pêşvebirina yekitiya jinan de girîng e. Jinan anîn ziman ku divê ji bo hevparbûn û yekitiyê xebat bidomin

Beşdarên Konferansa Jinên Kurd der barê girîngî û asta nîqaşên ku hatine kirin de axivîn. Hemû beşdar di wê baweriyê de ne ku konferansê roleke girîng ji bo tespîtkirina pirsgirêkan lîstiye û xwestin ku xebatên jinan ên hevpar bên domandin.

Parêzvana mafên mirovan û a jin Eren Keskîn ku tevli konferansê bû da zanîn ku navê pirsgirêkê pirsgirêka Kurdistanê ye û nabe ku li perçeyekê çareserî pêk bê. Keskîn wiha lê zêde kir: "Ji çar perçeyan pêk tê. Li her perçeyeke Kurdistanê pirsgirêkên mezin tên jiyîn. Jinên kurd jî van pirsgirêkan bi awayên herî giran dijîn. Jinên ku kurd 2 qatan zêdetir pirsgirêk dijîn. Ji ber vê yekê jî ev konferans ji bo afirandina riyen çareseriyê gelek girîng e. Ji ber ku pirsgiraka kurdan a serekê yekitiye. Pirsgirêka jinên kurd ya sereke yekitiya jinên kurd e. Li derveyî vê yekê divê polîtîkayên jinan ên li hemberî polîtîkayên zilam û şer jî bên afirandin. Li gorî min lazim e jinên li her çar perçeyan tim bên cem hev û civîna li dar bixin. Ji ber vê yekê ev civînek gelekî girîng e."

### Çar parçe li vir bûn yek

Endama Koma Aştî û Çareseriyê Gulbahar Çîçekçî jî hest û nêrînê xwe yên der barê konferansê de anîn ziman û wiha got: "Beriya her tiştî li vê axa pîroz û dîrokî gelek caran jin hatin cem hev. Lê cara yekemîn e ku ji çar aliyên Kurdistanê nûnertiyek mezin derket holê. Di konferansên neteweyî yên ku di nava 2-3 salan de dê bên lidarxistin lazim e jin biryarên çarenûsa xwe diyar bikin bidin. Ji bo çaresenûsa xwe bi xwe diyar bikin jî gelekî pêş niyar derketin holê. Li hemberî hin siyasetên Amerîkayê û yên Tirkiyeyê lazim e kurd bi xwe biryarên xwe bidin. Ev çend sal in ku bangawaziya me ya ji bo konferansek neteweyî heye. Lê hêj jî nehatine cem hev. Îro jinan carekê din raxistin ber çakvan ku van têgehan dişkînin. Li vir her çar perçeyan jî nûnerê jinan hene. Ev yek ji bo min tê wateyek mezin. Li gorî min ev yek ji bo konferansa neteweyî jî gavek mezin e û di pêşegiya jinan de destpêkiriye. Em hêvî dikin ku di demek nêz de konferansek neteweyî pêk bê."

Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak jî got ku li paytexta hemû dilan li Amedê gihiştina jinên kurd a hev pir watedar e û nêrînên xwe wiha anîn ziman: "Yekem car bi beşdariyek mezin û jinên li qadên cuda xebatan dimeşînin û bi delegasyonek xwedî nûnertiyek mezin re dicivin. Ji bo yekitiya kurdan xuya dike ku ev konferans dê roleke gelek girîng bilîze. Dîsa pirsgirêka şîdeta li hemberî jinan, pêkutiyên civakî û di plana duyemîn de veqetandina wan a ji jiyanê hate nîqaşkirin. Ev yek jî nîşan dide ku rêxistinbûna jinan gelekî bi hêz e. Ji bo bersivdayîna pirsgirêkên civakî jinên kurd îdiayek mezin nîşan dan. Me li vir dît ku pirsgirêkên jinan hevpar in. Jinên ku hem ji ber kevneperestiya civakê, hem jî ji ber şîdeta çavkaniya xwe ji dewletê digire û hem jî pêşdarazên feodal ên civakê rastî gelekî cureyên şîdetê tên. Konferans di warê hevparkirina çasereseriya pirsgirêkên jinan de dibe bingehek herî baş. Têkoşîna ku heta niha derketiye holê, asta têkoşîna derxistine holê û vîna jinan ji niha û şûnde hem rêxistinkirî û hem jî organîzetir û ji bo avakirina yekitiya neteweyî perspektîfa xwe ya çareseriyê hevpar kiriye."

### Heman pirsgirêkan dijîn

Nivîskar Nuray Mert ku ji Stenbolê tevli konferansê bû wiha got: "Ez kesekî pirsgirêkên jinan ji nêz ve dizanim nînim. Ji ber vê yekê jî temaşekirin û şopandina li vê konferansê ez ji bo xwe wekî fersendekê dibînim. Min naveroka konferansê nedizanî. Min pişt re zanî ku jinên kurd ên li çar welatan dijîn tevli vê konferansê dibin. Min gelek feyde ji nêrînên van jinan girt. Di konferansê de gelek nirxandinên girîng hatin kirin. Bi rastî ez ne li banda wê bûm. Min digot ji ber ku ji çar perçeyan jinên kurd hatine, konferans dê di nava hewayekî romantîk de derbas bibe. Nêzîkatiyê li hemberî jinê û tundiya li ser jinê bi zimanên tund hatin rexnekirin. Ez ji ber vê astê matmayî bûm. Min dît ku pirsgirêkên hemû jinên kurd yên li çar welatan dijîn wekî hev in. Di vê konferansê de gelek fikrên dewlemend jî derketine holê. Di niqaşan de hate dîtin ku pirsgirêk ne bi tenê pirsgira kurd an jî tirk e. Beriya hemû tiştî pirsgirêka jinê pergala desthilatdariya zilaman e."

### Li dijî neteweperestiyê ne

Niviskar Arzu Yilmaz jî yek ji delegeyên ku tevli konferansê bûyî ye û li ser naveroka konferansê wiha got: "Ez dixwazim bêjim ku piştî kurd hatin perçeyekirin ên nasnameya kurdan zindî hiştiye jinên kurd in. Lazim e têvgerên azadîxwaz navbera xwe û neteweperestiyê de vekirî bihêlin. Ger wiha be mirov dikare bêje ku bi vê civînê cin ji şîşêyê derket. Lê ji bo gav wekî ku Leyla Zana di axaftina vekirinê de got ji bo bibe ronesansa jinan lazime ev tevger tu carî neteweperestiyê neke. Nexwe neteweperestiya li ser yekitiya çar perçeyan a bi têgeha derdorê kurdan tijî dijmin in a dostên wan nîn e dê ber bi tiştên nexweş ve biçe. Ya herî girîng pêşxistina zanistiya rêxistinbûna jinan e. Ev yek ji bo hemû tevgerên femînist derbas dibe. Ger jinên kurd yekitiya neteweyî derbas bikin, hevpariyên jinan dê hemû neteweyan û erdnîgariyan derkeve holê û di astek neteweyî yan jî gerdûnî de tevgerên berfireh dê dînamîzmeke xurt avabike. Gavên piştî konferansê dê girîngtir bin û çalakiyên bi çi peyaman dê bên lidarxistin girîng in."

### Şer nasnameyê perçe dike

Sendîkavan û Aktivîsta Jinên Aştîxwaz Nebîle Irmak Çetîn jî wiha axivî: "Em li benda organîzekirina konferansa kurdan bûn lê me dît ku siyaseta zilam dinav de ye ev yek pêk neanî. Ev gava yekem ji bo me xwedî girîngiyekê ye. Dibe ku li tu dera cîhanê di bin van sernavên hevpar de nahatine cem hev. Lazim e ev konferans bên domandin. Ev 30 sal in li vê erdnîgariyê şerek tê meşandin û laşê me û nasnameya me perçe dike. Ez bawer dikim ku dema gelê kurd bên cem hev, pirsgirêka kurd dê bileztir bê çareserkirin û şerê tê domandin jî dê bisekine. Lazim e êdî kurd konferansek bihêz birêxistin bikin û gelê kurd, jinên kurd û vê xakê azad bikin."

### Riya veguhertinê vekirin

Parlamentera berê ya Parlamentoya Ewropayê Feleknas Uca jî li ser mijarê axivî û wiha got: "Heyecaneke mezin tevlibûnek gelekî xurt û gelek delegeyên giranbuha hene li vir. Yên ji nav xebatan û ji tevgerên siyasî beşdarî vê konferansê bûn. Beşdariyeke gelekî baş a ji bo nîqaşan hebû. Ji aliyê hemû jinan ve pêwîstiya lidarxistina vê konferansê derket holê. Ji niha û şûn de tenê gotin na di heman demê de pratîk jî divê. Lazim e jin li hemberî tevahî pirsgirêkên li hemberî xwe di nava çalakiyan debin. Ji ber niha li hemerî başûrê Kurdistanê êrîş û operasyon zêdebûne bi taybetî lazim e jin li hemberî şer di nava rêxistinên xwe de rolekî girîng bilîzin û ji bo operasyon bên sekinandin lazim e di nava hewldanekê debin. Kurd divê beriya hemû tiştî aştiya di nava xwe de avabikin. Lazime kurd li hemberî qedexeyên ziman û çandê û êrîşên tên domandin helwesteke hevpar ava bikin. Heta kurd aştiya di nava xwe de ava nekin em ê nikaribin nîqaş bikin. Lewra ji bo konferansek neteweyî ya navxweyî li dar bixin. Helwesta jinan kurd nîşan dide ku jinên ji bo aşityê amade ne."



## Bi hev re çûn Heskîfê

Jinên ku beşdarê Konferansa Jinên Kurd bûbûn çûn Heskîfê. Jinan diyar kirin ku ji bo ku Heskîf di bin avê de nemîne dê ji bo ku hestiyariya navneteweyî bi pêş bikeve, dê bikevin nava hewldanan. Jinên kurd ên ku ji Îran, Iraq, Sûriye û Ewropayê hatibûn çûn Heskîfa ku yek jî mîrateyên herî kevn ên cîhanê ye. Cîgira Şeradarê Êlihê Gulîstan Akel û Berdevka Jiyandina Hewldana Heskîfê Îpek Taşli jî tevli gera jinan bûn û rojeke nayê jibîrkirin derbas kirin. Jinên ku tevli gerê bûn li şikeftan, Tirbeya Zeynel Beg, sûk, qesrên mezin û biçûk, goristan, dêr û mizgefta kevn ziyaret kirin. Jinan diyar kirin ku Heskîf yek ji cihên herî xweşik ê cîhanê ye û çanda hevpar, xweşikbûna bêhempa a cîhanê ye. Daxwaza di bin avê de hiştina vê derê jî sucê mirovahiyê ye.

Berdevka Jiyandina Hewldana Heskîfê Îpek Taşli diyar kir ku Heskîfê bandoreke pir mezin li ser jinên ku ji çar aliyên cîhanê hatine kiriye û ew wateyê nadin daxwaza di bin avê de hiştine vê derê. Taşli wiha axivî: "Hem xweşkbûn hem jî dîroka Heskîfê hemû jin sermest kirin. Gelek ji wan cara yekemîn hatin vir. Me jî xwest ku jinên ku ji Îran, Iraq, Sûriye, Ewropa û Tirkiyeyê hatine Heskîfê bibînin. Dîtîna wê xweşikbûnê ji aliyê jinan girîng bû. Gereke pir baş bû. Min weke endameke Hewldana Jiyandina Heskîfê xwest xetereya ku li ber Heskîfê jî vebêjim, balê bikêşim û piştgiriyê bixwazim."

### Weke henek e

Ji Zanîngeha Harwardê Antropolog Kajal Rahmanî jî der barê gerê de wiha got: "Înada di bin avê de hiştina ciheke bi vî rengî weke henekekê ye. Tunekirina ciheke bi vî rengî ne aqilane ye. Heskîf mîrateya hevpar a cîhanê ye. Desthilatdar an jî welatek bi tena serê xwe nikare li ser nirxeke bi vî rengî tasarufê bike." ÊLIH

# Ziman hestên neteweyî bi pêş dixe

Helbestvan û nivîskara rojnameya me Hêvî Berwarî ku ji bo beşdariya Konferansa Jinên Kurd hatibû Amedê, der barê pirsgirêkên çand û ziman de axivî û da zanîn ku ziman hêstên neteweyî li mirovan bi pêş ve dixe.

Hêvî Berwarî, balkişand ser ku perçekirina gelê kurd û axa kurdan û anî ziman ku piştî ketin bin dagirkeriyên dewletên serdest polîtîkayên pişaftinê dest pê kir. Berwarî wiha axivî: "Çi ereb, çi faris û çi jî tirk be bi heman şêwazî polîtîkayên pişaftinê li hemberî gelê kurd meşandin. Li başûrê Kurdistanê li gel qetlîamên hatin kirin ên wekî Helepçe, Enfal û zilm û zordariyên hatin meşandin dîsa jî zimanê xwe parast." Berwarî, bi bîr xist ku piştî salên 1930'an radyoya kurdî hebû hunermendên kurd derdiketin, rojname û kovarên bi kurdî hebûn û hunermendên navdar ên wekî Mihemmed Şêxo, Eyşe Şan, Mihemet Arifê Cizîrawî dihatin û li Radyoyê Bexdayê de disitirîn. Berwarî, da zanîn ku piştî îmzekirina



peymana di navbera Îran û Iraqê de mafê otonomiyê ji dest kurdan çû gelekî medreseyên kurdî hatin qedexekirin.

Berwarî, destnîşan kir ku li wê medreseyê hînî rêbazên fêrbûna kurdî û helbestê bûye û hêj di wê demê de heskirina wê ya nivîsandinê bi pêş ketiye. Berwarî, da zanîn ku piştî dibistan qedand bûye mamoste jî, hikûmetê hîna jî hewl dida kurdî qedexebike û wiha axivî: "Wê demê digotin ji ber tenê dibistanek maye pêşeroja vî zimanî nemaye."

Berwarî, diyar kir ku kurdî li gel hemû qedexe û zextan xwe parastiye û heta îro hatiye. Lê dema mirov bandorên pişaftinê yên li ser başûr û bakur tîne ber hev ji ber ku li bajar bi salan in ku qedexeya li ser ziman didome û ber axaftina kurdî jî mirov tên cezakirin û kuştin. Dagirkeran li her perçeyekî bi pêkanînên cuda polîtîkayên pişaftinê meşandin. Berwarî wiha dom kir: "Lê dîsa jî nayê wê wateyê ku em hemû tiştan bixin situyê dijmênên xwe. Ji ber ku sitûnê zimanê kurdî di malê de ye û jin bingeha vê yekê ye. Jin çawa di jiyana civakî de xwedî bandorekê ne, di heman demê de afirînera ziman e. " Berwarî bangawazî li jinan kir ku wekî mamosteyên malbatên ziman bin ji ber ku malbat dibistana destpêkê ye.

### 'Bila bi kurdî siyasetê bikin'

Berwarî, helwesta siyasetmedarên kurd a nêzîkatiya kurdî jî rexne kir û daxuyand ku siyasetmedarên kurd li Tirkiyeyê gelekî caran peyamên xwe bi tirkî didin û wiha got: "Siyasetmedarên li bakur hem cil û bergên neteweyî li xwe dikin û hem jî peyamên bi tirkî didin. Lê ji bo mirovan dema peyam a Newrozê jî be mirovan dil xweş nake. Li gorî min ev yek gunehbariyek e û rastî rexneyên mezin jî tên."

### Jinan sînorên siyasî şikand

Berwarî, anî ziman ku kurdî zimanekî dewlemend e û wiha axivî: "Kurdî, zimanekî hêja ye, dewlemend e, zimanê Xanî, Feqiyê Teyran û Nalî ye. Lê ez xemsariya di vî warî ya li bakur rexne dikim. Ger rexne nebin, avakirin jî nabe. Dîsa siyasetmedarên me yên jin jî timî bi tirkî diaxivin. Lazim e êdî ji bo fêr bûna ziman bikevin nava hewldanekê. Heta derekê bi kurdî diaxivin lê pişt re dibêjin em nizanin."

Berwarî, destnîşan kir ku beriya çend salan sinorên siyasî hebûn, yên partiyan hebûn lê di vê konferansê de carekê din derket holê ku jinên kurd sînorên fikrî û partiyan şikandin û ber bi armanca neteweyî ve çûn. Peyama herî girîng a hate dayîn ev yek bû." AMED

# Dejenerasyona civakî

**Divê civak sedemên vê bûyerê bikole. Lewre her tecawiza ku tê kirin ne tenê li kesayetekê tê kirin. Di heman demê de li rûhê civakê jî tê kirin**

MIHEMED RONAHÎ *

Di nava hefteyekê de du bûyer li Sêrtê qewimîn. Her du bûyer jî ji hevdu xirabtir bûn û bi rastî jî asta mirovahiyê ya herî rezîl bû. Vê bûyera qirêjî, ya ku li Sêrtê qewimiye bes mînakek e. Hêj gelek bûyerên bi vî rengî ne tenê li Sêrtê, li gelek bajaran diqewimin û mixabin dê biqewimin jî. Yekî ku kêm hindik li rewşa civakê binêre dê têbigihê ku bûyerên ku li Sêrtê qewimîn bes du mînak in û hêj gelek mînakên bi vî rengî veşarî jî hene. Yanî van tecawizana ne girêdayî bastûra civaka Sêrtê ye. Li her derê bûyerên wisa pêk tên mixabin.

Bûyer bi hemû qirêjahiya xwe li pêş çavan e û her kes bûyerê dinahlîne. Lê bi ya min nahlandin têrî pêşîlêgirtina bûyerê nake. Divê civak rawest e û kûr û dûr li ser sedemên vê bûyerê bikole. Lewre her tecawiza ku tê kirin ne tenê li kesayetekê tê kirin. Di heman demê de li ruhê civakê jî tê kirin.

Ez dixwazim li gorî xwe ji sedemên vê bûyerê çend heban bijimêrim. Bi ya min sedema sereke pergala kapîtalîst e. Sedema duyemîn valahiya civakî û manewî ye. Sedema sêyemîn weşan û medyaya pergala dewleta tirk e. Sedema çaremîn apolîtîzekirina gel a ji aliyê dewletê ye. Sedema pêncemîn jî kêmasî an xeletiyên rêxistinên me ye. Niha em yek bi yek li ser van xalan rawestin.

Pergala kapîtalîst ne li vir tenê li her dera cîhanê ruhê mirovahiyê rizandiye. Wek felsefeyekê kapîtalîzm bes reqabet û pêşketina takekesî pêşniyarî kesan dike. Tu nirx û rûmeteke kapîtalîzmê ya ku wê girêbide tune ye. Mebesta vê felsefeyê bidestxistina hêza madî ye. Bi çi rengî dibe, çawa dibe ew zane. Kesê ku hêza madî bigire dest serketî ye, yên din têkçûyî. Ango di pergala kapîtalîst de kesê serketî yê pêşketî ye. Rê û rêbaza vê pêşketinê ne girîng e, mebest pêşketine. Yên ku pêşketin û hêza madî bi dest xistin, dikarin ji hemû xweşikahiyên vê jiyanê sûdê wergirin. Sînorê vê sûdwergirtinê jî sînorê hêza wan ya madî ye. Ango diravên wan têrî çiqasî bike dê ew qas sûdê wergirin ji jiyanê. Ji bo bidestxistina diravan jî riya herî baş danûstendin e. Naveroka vê danûstendinê ne girîng e. Ya girîng qezenca ji danûstendinê ye. Dibe ku di nava vê danûstendinê de rûmet û xîreta mirov jî hebe. Vê felsefeya qirêjî niha paradîgmaya herî serketî ye li hêr dera cîhanê û roj bi roj bilintir dibe alaya vê felsefeyê. Bawermendên wê roj bi roj zêde dibin mixabin. Dê hê jî zêtir bibe wisa xuya ye.




Sedema duyemîn valahiya civakî û manewî bû. Mixabin ku mirov dema rabirdûya vê civakê û rewşa niha tîne ber hev, di nav de cudahiyek mezin xuya ye. Di nava fikr û ramanên kurdên bîst sal berê û yên niha de jî ev cudahî xwe dide der. Ciwanên me yên bîst sal berê û yên niha ne yek in. Bîst sal berê polîtîzebûna ciwanan ji zarokatiya wan dest pê dikir. Hêj li dibistana navîn (ortaokul) polîtîze dibûn keç û xortên kurdan û xwe bi vî rengî digihandin. Lê niha dev ji dibistana navîn û lîseyan berdin keç û xortên zanîngehan jî bi piranî di nav pergala desthilatdaran de dijîn. Keç û xortên bîst sal berê di dibistana navîn de dest bi xwendina kitêban dikirin lê niha zanîngehan diqedînin ku deh kitêb nexwendine piranî. Kesên wisa yên bi mebest jî bivê nevê dê xwe di valahiyekê de hîs bikin. Keç û xortên me yên hêja jî gelek in, lê dema mirov li piraniya wan binihêre li dibistan û zanîngehan, mirov dê bibîne ku kesên bê mebest û bê hêvî ne. Kesê ku mebestek li ber dilê wî tune be dikare her tiştî bike.

Medya û weşana dewleta tirk jî sedema dejenerasyona civakê ye. Di medya tirk de weşanên tv'yan hatine wê radeyê ku êdî bi rastî jî malbatek nikare bêyî sansur tv'yan bi zarokên xwe bide temaşekirin. Ji her aliyî de bandorê li ruhê mirovan dike medyaya tirk. Ji weşanên erotîk bigirin heya yên mafyatîk û leşkerî seranser weşanên ji pestan tê kirin di medyaya tirk de. Em dikarin vê mijarê vekin lê hewcedarî pê nîn e bi ya min. Ji ber ku medyaya wan li ber çavan e.

Apolîtîzasyon siyaseta dewleta tirk ya herî kevnar e. Ji avabûnê komarê heya îro dewlet ji bo ku desthilatdariya xwe hêzdartir bikene tenê kurdan an nijadên din, tirkan jî apolîtîze dike. Lê vê yekê nabîne ku apolîtîzasyon wek çeka xirabe xwediyê xwe birîndar dike. Lewre dewlet bi apolîtîzasyonê ruhê gel dikuje û kesê ku ruhê wî bimire dikare her karî, her kirinê bike. Ji van kirinan yek jî ev bûyer in. Ango tecawiz in.

Sedema dawî jî wek rexneyekê ez digirim dest û dibêjim kêmasî û xeletiyên me ne. Sedema vê dejenerasyonê. Jixwe dewlet bi hemû hêza xwe hewl dide ku gel ji nirxên xwe bifeşilîne. Heke em li hember dewletê nikaribin hewzekî nirxan ava bikin, em ê nikaribin pêşiyê li dejenerasyona gel bi taybetî jî ciwanan bigirin. Divê rêxistinên me kirasên xwe yên rêxistinî li aliyekî daynin û gel vexwînin hewzê çand û dîroka kurdî ya kevnar. Panzdeh bîst sal berê hemû hezkerên rêxistinê xwe wek şoreşgerekî didît û çandeke şoreşgerî hebû di nava rêxistinî de. Erê hejmara endam û hezkeran kêm bû, lê hemû hezkeran xwe wek şoreşgerekî didît. Niha hejmara hezker û xebatkaran zêde bûye lê piraniya hezker û xebatkaran ji ji çand û hişmendiya şoreşgerî dûr e. Divê rêxistinên me li bersiva vê pirsê bigerin. Wê demê bersiva van kirinên lewitî û qirêjî jî dê jixweberê were dîtin.

* Civaknas



Mem Mîrxan
mmirxan@hotmail.com

## Kes nikare gelê kurd bike pêxwarinî

Hemû Tirkiye niha li guhertina Destûra Bingehîn û hevdîtinên wê yê li meclîsê temaşe dike.

Li ser mijarê gelek nirxandin têne kirin.

Bi taybetî jî çapemeniya Felhullah Gulen.

Di hemû nûçe û şîroveyan de behsa tewra BDP'ê tê kirin û tê gotin ku " BDP li raya gel guhdarî nake"

Li gorî wan "Gel guhertina Destûra Bingehîn dixwaze."

Em bêjin baş e.

Heta rast e jî gel guhertina Destûra Bingehîn dixwaze.

Lê necamêrno! ne tenê çend xalên ku AKP dixwaze.

Guhertina hemû destûra bingehîn a ku encama cûntaya faşîst a 12'ê îlonê ye dixwaze.

Gelê kurd dehan caran ev daxwazên xwe anîn ziman .

Qirik bi xwe nehiştin.

Mû bi zimanê wan ve hat.

Hûn li ku bûn kumpîsno!

Çima hûn van daxwazan nabihîzin?

Dê zarokên di zindanê de çawa bin?

Hemû siyasetmedarên weke hêsîr di destê hikûmetê de wê çawa bibin?

Dê heta kengî "çîroka yek al, yek ziman, yek welat" bê gotin?

Li derve vê mijarê xalek din jî heye

Ew jî divê em kurd xwe bi xwe biaxivin.

Di rewşên wiha de divê Kongreya Civaka Demokratîk tavilê bicive û biryarê bide.

Gelê kurd dê destekê bidin guhertinek bi vî rengî yan na?

Ev gelek girîng e.

Bêdengmayîn û deregmayîn zirarê dide siyaseta kurd.

BDP'ê bi derengî be jî biryarek rast girt.

Çend xalên ku guhertina wan di rêziknameya BDP'ê de jî cih digirin destek kirin.

Girtina partiyê, Peymana Giştî ya wê bi memûran re bê îmzekirin û xalên din.

Jixwe BDP diviyabû destek bidana van xalên navborî.

Lê jî bo bi giştî destekê bide guhertina Destûra Bingehîn divê AKP îradeya gelê kurd nas bike. Gelê kurd ne bê tercih û bêxwediye. Gelê kurd ne pêxwariniya tu kesî ye.



Serkeft Botan
serkeftbotan@hotmail.com

## Bettanî kî ye?

Koklêanîn û komkujiya milletekî ya herî mezin şikestina rabirdû û dahatûya wê ye. Xesandina demarên wê yên çand û hunerê ne. Civaka ku çand û wêjeya xwe û dîroka xwe nizanibe tê maneya ku ne li ser hişê xwe ye. Mêjiyê wê civakê şolî ye û zelaliya ber xwe nabîne. Qod û sembolên xwe nasnakin û nizanin. Peyv û axaftinên wê tu stûnên zêrînî ji jiyanê re avaneke. Jiyanek xav û bê tam dê birêse û ji xwe xerîb dê bimîne. Di asoyên wê civakê de dê ewr avî nebin û di siberojên wê de tu qira li ser singpelên wê gulxokên hebên ava jiyanê dê kom nebin û çirûsek jî dê nedin.

Di hefteya borî de me behsa mekteba Heranê û zanyarên wê demê yê ku jê pengizî bûn çend nav aşkera kiribûn ku yek ji wan zatê mezin jî BETTANÎ ye.

Dagirker ji bo teror û şêlûya nav û nenaskirina kesa/î ku çêkin binêrin ku navê vî zatê mezin ku çiqas dûdirêj kirine û alozî û terora tênegihiştinê anîne meydanê. Navê Bettanî: "Ebu Abdullah Muhammed bin Cabir bin Sinan er-Rekki es-Sabî el-Bettanî" di belgeyên heyî de nivîsandine. Dema ev navê dûdirej ku bê danûhurandin bi vî awayî ye. Navê kalê wî Abdullah Mûhemmed e. Li gorî şêlûya hevokê weke awayê ku du bavê wî hebin lawê Cebir û lawê Sinan û zayina wî Rekke be û kesekî sabiî be. Weke ku tê zanîn ola hezretî Brahim Sabiî bû. Sabiî bi cismên ezmanî dixemilin mînak weke heyvê, rojê û stêr û gerstêra bawerî dianîn. Ew jî mirov ber bi baweriya zerdeştiyê ve daf dide. Ji xwe ekola zanyarên mekteba Heranê tevayên zanistiyên xwe li gorî felsefeya du xwezayetiyê hûnandine. Mekteba Heranê du xwezayetiyê diparast ji ber ku xîtabî civakên aryaniyan dikir. Mekteba Entaqyayê yek xwezayetî parastiye û xîtabî Nîvdorgeha Erebistanê kiriye. Wê mektebê bingeha saziya pexemberiyê xweş kiriye û olên samî bi taybetî Îslam jê derketiye. Mekteba Îskenderiyê (Misrê) sê xwezayetî parastiye bav û law û ruhê pîroz hevokek bi tirkî wiha tê gotin (baba, ogul ve kutsal ruh) vê mektebê jî bingeha baweriyên li Evropayê hûnandine. Tariqatên katolîkan, protestanan û wekî din jê derketine. Wê mijar pir dûdirêj bibe. Em ê nikaribin Bettanî bidin nasîn.

Bettanî ji gundekî Heranê ye û kurd e. Lê weke kesekî ereb tê zanîn. Ji dayikbûna wî li gorî saljimara miladî (858) mirina wî jî (929) cihê mirina wî jî tevlihevbûnek tê xuyakirin. Jixwe şunwarên tirbên ê ku bi gelê kurd re dijminayî kirine û gelê kurd di komkujiyan re derbas kirine tirb û ziyaretgehên wan henê lê yê ku bi kêrî kurdan hatine cih û warên tirbên wan ne diyar in. Mînak bidin ew qas qira kurdan aniye goristana wî li çar riya deriyê çiyê dibin Sûra Amedê de ziyaretgeh e. Lê goristana Şêx Seîd hêj winda ye. Ev polîtîkaya beriya niha bi hezar salan li ser vê axê hatiye meşandin û hê jî berdewam e. Dagirker destûrê nadin ku gerîlayên şehîd dikevin goristanek ji bo wan bê avakirin.

Bettanî bi van karyerên zanistiyê cîhan wî nas dike astronom, astrolog û matematikvaniyê. Bettanî salek wiha hesibandiye. 365 roj 5 saet 46 deqîqe û 24 saniye. Cîhan Betanî weke otorîteyek karyariya zanistiyê wî dihesibê. Di warê matematîkê de sînus hesibandina tanjantî şîrove kiriye, bingeha "trîgonometriyê" ava kiriye. Bi navê "Zij" berhem nivîsandiye. Ev berhem dibêjin li Watîkanê ye. Kopernîk minetdarî û spasiya xwe ji Bettanî re aniye.

Hizirîna "tanjant û kontanjantiyê" hesibandiye û gelek têgehên di matematîkê de berhemên wî ne. Kurahiya ser heyvê (kirater) ku bi navê Albategnîûs tê bilêvkirin xelatî Bettanî hatiye kirin.

*Nişe: Di nivîsa Rezanî ki ye Camiya Mezin Ulu Camî ne ya Amedê ye ya Cizîra Botan e.*

***Çavkanî:***

*1. http://www.daviddarling.info/encyclopedia/A/Albategnius.html*
*2. http://www-history.mcs.st-andrews.ac.uk/Biographies/Al-Battani.html*
*3. E. S. Kennedy, A Survey of Islamic Astronomical Tables, (Transactions of the American Philosophical Society, New Series, 46, 2), Philadelphia, 1956, pp. 10–11, 32–34*
*4. C. Singer (1959), A Short History of Scientific Ideas, p. 151, Oxford University Press (cf. Salah Zaimeche (2002), Muslim Observatories, FSTC)*
*5. "trigonometry". Encyclopædia Britannica. http://www.britannica.com/EBchecked/topic/605281/trigonometry. Retrieved on 2008-07-21*

www.arsivakurdi.org

# Dildar yek ji paleyên hîmê yekitiya neteweyî ye

**Dildar yek ji wêjevanên ku bi pênûsa xwe hîmê yekitiya neteweyî kolaye û xîtabî hestên hemû kurdan kiriye. Ew bi 'Ey Reqîb' li ser dilê gelê kurd textê xwe danî û lê rûnişt. Dildar yek ji paleyên serkeftî yê yekitiyê bû**

"Kes nebê kurd dimirin / Kurd jîn dibin / Jîn dibe, qet nakeve ala kurdan" nivîsarê van rêzikan Yunis Raûf, bi navê ku pê tê naskirin Dildar… Dildar, di sala 1918'ê de li bajarê Koysencaqê, hate dinyayê. Di piraniya helbest, çîrok û wergêrên xwe de mahlasa Dildar bi kar anî. Û bi vî navî navdar bû.

Dildar ji Ranyayê dest bi perwerdehiya xwe kiriye û di sala 1935'an de li Hewlêrê temam kiriye. Piştî xwendina lîseyê li paytext Bexdaya Iraqê Hiqûq xwend. Lê ji ber hezkirina xwe ya ji bo wêjeyê parêzerî nekir û ji sala 1940'ê şûnde dest ji parêzeriyê berda.

Dildar helbestvanekî welatparêz û şoreşger bû. Bi helbestên xwe yên bi navê 'Ey Reqîb' û 'Kurdistan' li ser dilê gelê kurd textê xwe danî. 'Ey Reqîb' li çar parçeyên Kurdistanê bi hêmaya yekgirtina gelê kurd hate xwendin. Û bi vê helbestê Dildar bû yek ji wênevanên ku hîmê yekitiya neteweyî havêtiye. Dildar bi helbest û sekna xwe ya siyasî bû yek ji paleyên xîmê yekitiya neteweyî.

Di sala 1946'ê de dema Komara Mehabadê hate avakirin, helbesta Dildar 'Ey Reqîb' wekî sîrûda neteweyî ya komarê hate qêbulkirin. Û 'Ey Reqîb' îro li çar parçeyên welat bi heman hêmayê tê xwendin.

Dildar di helbestên xwe de sûd ji Hecî Qadirî Koyî, Bêkes, Pîremerd û Wefayî girtiye. Yekemîn helbesta wî di sala 1935'an de di kovara Ronahî de hatiye weşandin. Dildar ligel wêjevaniyê dest daye kar û xebatên siyasî jî. Dildar di nava Partiya Hîwa de siyaset kiriye. Û yek ji pêşengên sazkar ê vê partiyê ye.

Dildar di sala 1948'ê de çû ye dilovaniya xwe. **AMED**

### Ey Reqîb (Soranî)

*Ey reqîb her mawe qewmî kurd ziman,*
*Nay şikênê danerî topî zeman.*
*Kes nelê kurd mirduwe; kurd zînduwe,*
*Zînduwe qet nanewê alakeman.*

*Ême roley rengî sûr u şorişîn,*
*Seyrîke xuênawiya raburdûman.*
*Kes nelê kurd mirduwe, kurd zînduwe,*
*Zînduwe qet nanewê alakeman.*


*Ême roley Midya û Keyxusrewîn,*
*Dînîman û ayînman her Nişteman*
*Dînîman û ayîman Kurd û Kurdistan*
*Kes nelê Kurd mirduwe, Kurd zîn duwe,*
*Zîn duwe qet nanewê alêkeman.*

*Lawî kurd hestaye ser pê wek dilêr,*
*Ta be xuên nexşîn deka tacî jiyan.*
*Kes nelê Kurd mirduwe, Kurd zîn duwe,*
*Zîn duwe qet nanewê alêkeman.*

*Lawî kurdî hazir u amadeye,*
*Giyan fîdane, giyan fîda, her giyanfîda.*
*Kes nelê Kurd mirduwe, Kurd zîn duwe,*
*Zîn duwe qet nanewê alêkeman.*

### Ey Reqîb (Kurmancî)

*Ey reqîb her*
*maye qewmê kurd ziman*
*Naşikêne danêye*
*topê zeman*
*Kes nebê kurd dimirin,*
*Kurd jîn dibin*
*Jîn dibe, qet*
*nakeve ala Kurdan*
*Qewmê kurd rabû ye ser pê wek şêran*
*Ta bi xwîn nexşî bike*
*taca jiyan*
*Em xortên Mîdya*
*û Keyhûsrew in*
*Dîn, îman, ayînman e,*
*Kurd ûKurdistan*
*Em xortên rengê*
*sor û şoreş in*
*Seyr bike xwîna*
*ciyan me darijand*
*Xortê kurd her*
*hazir û amade ne*
*Can fîda ne, can fîda,*
*her can fîdan.*






## Kovara Çirûsk wêjeya kurdî diçirûsîne

Kovara hunerî û ramanî Çirûsk ku 4 mehan carekê derdikeve bi hejmareke dewlemend derket pêşberî xwînêrên kurdî.

Kovara Çirûsk di hejmara xwe ya 9'an ya gulan-hezîran-tîrmeh-tebaxê de gelek mijarên hêja ji xwînêrên xwe re radigihîne. Heta niha li ser aboriyê kêm nivîs hatine nivîsandin Rênas Jiyan bi nivîsa 'Aboriya klasîk' girîngiya ekonomiyê ji destpêkê girtiye dest.

Her wiha nivîseke din ya balê dikişîne nivîsa Bedîuzzeman'î 'Kurd dîsa muhtac in' bi navê Mele Seîdê Meşhûr ku di rojnameya 'Şark û Kurdistan'ê hatibû weşandin di vê hejmara kovarê de cih girtiye.

**Hevpeyvînên di kovarê de**

Di vê hejmara kovarê de du hevpeyvîn hene. Li ser medyaya kurdî, rewşa televîzyona kurdî çawa ye, pirsgirêkên din û gelek mijarên din bi Rêşad Sorgul re hatiye çêkirin. Hevpeyvîna din jî li ser muzîka metalê bi solîstê koma Ferec, Reh re hatiye çêkirin. Hevpeyvînê bal kişandin ser mîsyona komê, çima muzîka metalê û pirsgirêkên muzîka kurd.

**Pexşan, çîrok, helbest**

Kesên ku helbest, pexşan, krîtîk, çîrok, li ser ziman û hwd. yên di kovarê de nivîsî ne wiha ne: 'Aşê Zemên' Berken Bereh, 'Ax' Feratê Dengizî, 'Çend Xilmaşî' Konê Reş, 'Çewtiyeke çîrokiya dema bê 'a'ya zêde' Bahoz Baran, 'Daşaran' Sînan Sutpak, 'Di berhemên Dostoyevskî de pirsgirêka mirovahiyê' Moran Ezdîn, 'Du masiyên qerîmok' Ar-da Janxwar, 'Evd' Mahsûm Çiçek, 'Heyirandin' Lokman Ayebe, 'Kund dixwîne li kavilên helbestê' Şengul Ogur, 'Lêborînên bilorîn' Jan Ziryan, 'Lep-qut' Bawer Rûken, 'Li Golgothayê' Seydo Ozkan, 'Mêvan' Hesenê Metê, 'Mêtiya ku ji koka xwe dûr dikeve' Bişeng Xecê Pêşeng, 'Mirina cotê keziyên sor' Mirad Gundikî, 'Romaneke bi rûyê post-modernîzmê xemilandî' Lokman Polat, 'Tilîliyên gernasan' Şivan Ar, 'Xwekuj' Bargiran Şanaz, 'Zen û ziman' Latîf Epozdemir. **AMED**

# Jiyana kurdên koçber di fîlma Mandû de

Derhênerê kurd yê rojhilatê Kurdistanê Îbrahîm Seîdî fîlmeke sînemayî bi navê "Mandû" li ser koçberbûna neteweya kurd çêkiriye ku 90 deqeye û behsa nexweşiyên kurdan dike.

Îbrahîm Seîdî der barê fîlma xwe de agahî dan û wiha got: "Piştî mandibûneke zaf me karî berhema dawiyê ya xwe bi dawî bînin ku fîlmeke sînemayî ya 90 deqeyî ya bi navê "Mandû" ye û behsa derteserî û daxwaza kurdên koçber dike ji vegeryan bo welatê xwe."

Seîdî wiha pê de çû: "Bûyerên vê fîlmê li Çemçemal, Segel û Bergelo hatine wêne girtin û berhema Wezareta Rewşenbîrî û Ciwanan û Rêveberiya Sînemaya Hewlêrê ye, rêveberê berhemê Ferzîn Kerîm e û Bayram Fezîle wekî wênegir tê de kar kiriye."

Biryar e ev fîlme bo beşdarîkirin di çend mîhrîcanên navdewletî de bo derveyî Kurdistanê bê şandin.

Îbrahîm Sedîdî derçûyê zanîngeha sînemaya hunerî ya Tehranê ye, bi fîlma "Dayikên min" beşdariya çendîn mîhrîcanên cîhanî bûye û hejmarek xelat bi dest xistiye. **HEWLÊR** *(aknews)*



## Karkerên cîhanê ji bo fîlman tên cem hev!

5'emîn Mîhrîcana Fîlmên Karkeran a Navneteweyî îsal li Stenbol, Enqere û Îzmîrê di heman demê de li dar dikeve.

5'emîn Mîhrîcana Fîlmên Karkeran a Navneteweyî îsal di navbera 1-10'ê gulanê de li Stenbol, Enqere û Îzmîrê di heman demê de li dar dikeve. Mîhrîcan ku armanca wê ew e ku jiyana kedkarên li dinyayê, tecrubeyên di têkoşîna wan de bi fîlman pêşkêş bike ji aliyê sendîkayan ve tê organîzekirin. Mîhrîcan dike ku karker, kedkar û mirovên feqîr jî berê wan bide hilberîna fîlman.

Mîhrîcan niha wê li van sê bajaran li dar dikeve û dûre dê berê xwe bide bajarên wekî Edene, Trabzon, Bursa, Eskişehîr, Bolu (8 Gulan), Amed (19 Gulan) yê.

Li Stenbolê ji bo Mîhrîcanê dê meşek û dûre jî merasîma destpêkê li dar bikeve. "Meşa Kevneşopî ya Mîhrîcanê" roja 2'yê gulanê saet 18'an de li rawestgeha Tramvay a Taksîmê dê dest pê bike û heta ber Salona Sînemayê ya Yenî Ruyaya Beyogluyê bidome. Di saet 19'an de jî li Yenî Ruyayê dê merasîma destpêkirina Mîhrîcanê li dar bikeve. Di merasîmê de dê Nihat Berham helbestên xwe, hunermend Îlkay Akkaya jî stranên xwe pêşkêş bike. Di şevê de dê plaketên sipasiyê jî pêşkêşî kedkaran bikin.

Di dawiya şevê de dê fîlmê li ser berxwedêrê Tekelê bê nîşandayîn. Her wiha di Mîhrîcanê de 15 fîlmên li ser Tekelê hene. Mijara bigehîn a Mîhrîcanê a îsal "Xebitandina bê ewlehiyî û têkoşînên li hemberî vê têne dayîn" e. Ji gelek welatan li dor 50 fîlmî dê bêne pêşkêş kirin.

Fîlmê Fîlîz Gazî "Olmasa", yê Metin Yegin "D", yê Elîf Ergezen "Mukellef", yê Anîta Ogurlu û Ahmet Oncu "Nakît" hin fîlmên ji Tirkiyeyê ne ku dê bêne nîşandayîn.

Dîsa fîlmê Pelîn Esmer "11'e 10 Kala" yê, Îlksen Başarir "Başka Dîlde Aşk", yê Orhan Eskîkoy û Ozgur Dogan "Du ziman û baholek", yê Ahmet Uluçay "Karpuz Kabugundan Gemîler Yapmak" jî dê derkevin pêşberî temaşevanan.

Di nav mêvanên biyanî yê Mîhrîcanê de ji Îrane derhênerê navdar Mecîd Mecîdî, ji Ingilistanê John Cunnigham, her wiha Pascale Boosten, Eric Juzen, Eleftherios Georgiadis wê bi berhemên xwe bibin mêvanên Mîhrîcanê.

Dîsa di çarçoveya Mîhrîcanê de dê hin pêşangehên li ser karkeran in jî bêne li dar xistin. **STENBOL** *(diyarname)*




## Weşanxaneya Belkî 'A Baş' weşand

Weşanxaneya Belkî pirtûka Bahoz Baran a ji 19 kurteçîrokan pêk tê weşand.

Weşanxaneya Belkî pirtûka Bahoz Baran a bi navê 'A Baş' ku ji 19 kurteçîrokan pêk tê raberî xwendevanan kir. Bahoz Baranê ku ji Licê ya Amedê ye di sala 2008'ê de ligel M.Bilbil bi navê 'Rêzimana Kurmancî' yekemîn pirtûka xwe dabû çapkirin. Bahoz Baran heta niha ligel mamostetiya zimanê kurdî gelek pexşan jî weşandine û ji bo demekê jî xwedîtiya kovara Tîgrîsê jî kiriye.

Bahoz Baran di pirtûka xwe ya çîrokan de cih daye kurteçîrokên wekî 'A Baş', Gora Xalê Cindî', 'Namûsa Hejmaran', 'Mala Hanê' û 'Kaniya Nûjen'. Di pirtûkê de pirsa ' Di wêjeyê de 'a baş' kîjan e?, hatiye kirin. Bahoz Baran bi vê pirtûka xwe tevli karvanê wêjenisên kurd ên xwedî pirtûk bûye. **AMED**

www.arsivakurdi.org

# Xweş bêhn e barana devbiharan

Dê çi bikim, te jî dît, baran barî lê bêhna axê nehat, loma min jî ji hemû mirovan, cot cot çendikên baş rakirin birin girestêrkeke din û yên ku ji ber mayî jî min di cîhanê de wer kirin

WELAT DILKEN

Zivistan ne tê de, ez ji barana hemû demên din hez dikim. Bi taybetî jî, ji ya devbiharan û ya meha gulanê. Hewa ne sar e, axê bêriya baranê kiriye û dema ku çilkên tava yekem dikevin ser pişta erdê, ax, hemû bêhna ku bo pêşwaziya baranê amede kirî, li ber bê dixe û ew bêhna jiyanî hemû berên nefesê dorpêç dike. Ku çend nefesan jî bikşînî hundirê xwe, tu yê jê têr nebî û hilma xwe tim ji yeka din re bidî ser zimên.

Belkî, di dilê û bendewariya me de baraneke devbiharan ku bibariya tunebû. Ger dema ku me çarsiya bajêr gav dikir, bêhtir ezmanekî bi rojê vekirî, bayekî ku xwe avêtî paş çiyayên bakur, dê hê bêhtir ger, an dema me aramtir bikira. Lê, ku dem devbihar be, ro li danê nîvro be, ji daxwaza firavînxwarinê wêdatir, ya rast tu bixwazî, daxwaz ji demê têr xwarin e, ya ku ez ligel te divêm. Di nav keftelefta bajêr de, hê me çend gav avêtin yan neavêtin, bayekî xwe di paş çiyayekî bakur de filitand û li derdora me carekê kir vizeviz. Mirovên li derdora me vir de wê de dan gavan, her yekî/ê xwe bi hêlekê de avêt. Em û ba, bi tena serê xwe man li ortê. Jixwe dem devbihar bû, piştî her bayê ku hinekî wekî dînan dide lotikan û tozê bi ser xwe de dike, teqez di nav tîrêjên rojê re tavek baran jî bejna xwe dirêjî erdê dike ta axê.

Ez jî demên wiha ne bi gazinc im. Belkî jî gazincan wêdatir, ez wekî zarokekî şa û bextewar jî dibim. Lê, te nizanim, nizanim tu jî ji barana devbiharan hez dikî yan eciz dibî?.. Tiştê ku mirov di demên wiha de eciz bike, yan jî dike ba ye. Erê erê, bayê ku ez qalê dikim yê ku wekî mirîşka gêj lê tê ye. Carekê di vir de carekê di wir de diçe û tê, lê nikare berê xwe bibîne. Te nizanim, lê dibêm belkî porê te eciz bûbe. Bê, dema ku xwest porê te bike giloka pîrê, eciziya porê te li rûyê te hinekî gazinc ji yê zana re dida xwendin.

Gelo em karibin xwe bigihînin cihê ku me xwe lê girtî, yan em sîvnengekê yan jî taldeyekî bibînin û xwe bidin ber, da ku tu û dema ku bûyî para wê demê şil nebe.

"Hê ku baran pir nebariye ez divêm em bimeşin, em ê karibin xwe bigihînin wir… Nizanim, belkî jî em xwe bidin bin vê rawestgeha han heya ku baran sekiniye… Di dilê xwe de dibêjim bibore, min hesabê êşa te nekir. Bi baranê re dubare, careke din dibêm bibore"…


Zuhêr Hesîb

Me rawestgehek dît, yan rawestgehê xwest li ser kursiyê xwe cihekî bide liber baranê revîna me. Di serî de tu rûniştî, min xwest bi çend dilopên barana devbiharan por û serçavên xwe şil bikim. Nabe jî, lê hêviyeke, em jî ji axê ne, belkî bêhna axê li ser-rûyê me jî bifûre. Loma, min xwe hinekî jî derengiyê xist, lê li bêton û rêyên nefta şewitî, mixabin ne bêhna axê, bêhna kizirînê dihat. Di nav tîrêjên rojê re, tavbaraneke ewqas xweş dibarî lê çilkekê jî mistek ax nedidît, axê jî çilkek baran nedimijand û bêhna jiyanî nedifûrand bi bervî hilma me.

Min neçarî, ji neçarî xwe da ser paldanka rawestgehê û em tev rûniştin. Ger di bin vê tavbaranê de hinekî bêhna axê jî bihata, bi te jî ew dem dê hê xweş û cizbî nebûya?... Dibêjim, xwe bi xwe re dibêjim û her çiqas guhên min li dengê te yî ku di nav çilpeçilpa çilkên baranê re xwe digihînin guhên min dibihîzim jî, lê careke jê hay dibim ku bêhna axê ji te tê. Yan jî difikirim, wekî min tu jî ji axê yî, gelo bi wan çend çilkên baranê yên ku xwe avêtî nav por û ser çavên te, a ji te bêhna axê yan bêhna devbiharan neyê? Di nav wan fikr û bi belkiyekê ku nebûyiyê bûyî dike, hilma hestên xwe dixim nav bêhna axa ku ji aliyê hebûna te de tê û xwe bera nav xeyaleke daxwaz pak, lê pêkhatin zor didim...

***

Li ser çiyayekî bilind, li pozê refekî dirêj, em dîsa li keleka hev, li ser heman paldankê rûniştine. Demsal tam orta biharê ye. Em li pêşiya xwe, li newal, li nava geliyan, bi ser girikan de, li çiyayên ku ji yê em li ser rûniştî biçûktir, li dar û daristanan, li hêşin hêşin giha û nefel, li gul û kulîlk, ji bihûşta Adem û Hewayê xweştir bihûştê mêyze dikin. Li derdora me çivîkek dadinişe yek li ba dikeve. Li ser keviran re xezalek hil dibe dadikişe jêr yek hildikişe. Kulî dikin çîveçîv, pinpinok li ber tîrêjên roja ku bi ewran re çavneqan dilîze, rengistana rengan çê dikin li ser perên xwe.

Tu, tu nedipeyvî, tu nedipeyviyayî… Bayek dihat lê ne ew bayê ku xwe li paş çiyayên bakur de veşartî bû, bayê ku dihat bayê palevanan bû. A ew ê ku bêyî palevanan kes jê re ne heyran e. Porê te bi wî bayî re dilîst, bi hev şa dibûn, belkî destmalekê sor jî di dest bû û ser govend jî digerand, lê hê jî tu nedipeyviyayî. Ez jî neçarê peyvan, ez jî nedipeyvîm. Çavên me dipeyvîn, ne ji hev re, ne ji me re, haya me ji çavên hev tunebû, belkî bi dîmenê ku jê mêyze dikirin re dipeyvîn.

Bêyî hemdê min, milê min bi milê te bû, bêyî ku bi aliyê min de mêyze bikî, te got, her tişt baş e, her tişt xweş e, her tişt heye û li vir e, lê ka çima mirov tunê ne?... Çivîk difirin, pelên daran bi hev re dilîzin, xweşiya reng û hêşinahiya gilî û giha çav û dilê mirov têr û têr dike. Te domand û got, ka mêyze ke, kesko hilatiye, teyr û tilûr bi hev re ketine pêşbaziyê, kovî û xezal bi hev şa dibin, her tişt di nav pergal û aramiyekê de ye, her heyîna ku difire, dimeşe yan li cihê xwe nalive di nav ahengekê de ye lê, lê fam nakim, ka çima mirov nexuya ne, ew tunê ne.

Ger ku milê te taya kelecanê bi neçariya min nexista, ku ez lal, ez bê ziman, ku mêjûyê min kût, ku stûyê min nexista nav tirsonekiya ku newêrim bi aliyê te de binêrim, min ê bibervî aliyê te mêyze bikira û bigota, bêhnxweş biharê, ez hûr û kûr fikirîm, min bi vir de bir bi wê de bir lê nebû, min rê ji rewş û halê cîhana me ya ku bi bervî tunebûnê ve tê birin re nedît. Ez fikirîm, ger rewşa mirovahiyê wiha biçe, wê nehêlin ku em li vê rawestgehê, li ser vê paldankê rûnin. Tu jî dibînî, bi vê jî nasekinin, cîhana me di nav şer, zilm, qirêjî û kuştinan de hiştine, ji dewsa avan di çeman de xwîn dihêrike. Xweza xeniqandine, kanî miçiqandine, hewa fetisandine…

Dê çi bikim, ne te jî bi çavên serê xwe dî, baran barî lê bêhna axê nehat. A loma, min jî ji hemû mirovan, cot cot çendikên baş rakirin birin girestêrkeke din û yên ku ji ber mayî jî min di cîhanê de wer kirin. Ez fikirîm, ger heya çend hezar salan ew mirovên baş ku li wê girestêrkê bimînin wê dîsa vegerin ser xwezayîbûna xwe. Belkî cîhan jî heya wan çend hezar salan birîn û xisara ku jê hatiye kirin xwe bi xwe derman bike, û a wekî ku tu aniha dibînî, belkî ser rûyê erdê dîsa bibe bihûşt. Yanê bêyî ku mirovan dûrî cîhanê bixî, bawer bike çareserî tunebû, çare tunêêê...

Lê min çi dikir çi nedikir jî min nedikarî bi aliyê rûyê te de binêrim û vê bibêjim. Bibêjim, a ji ber vê sedemê mirov nexuya ne, loma tu mirovan nabînî.

Ez hê di nav dudiliyê de bûm, min dixwest ku ji rûyê te mêyze kim û bêjim, tu bêhn dikî ne, çi bêhnek xweş ji axê tê… Lê ji nişkeve dengê te li derî xeyala ku ez di nav de bûm hat…Ka em rabin û biçin, baran sekinî.

Min xwe bi xwe got, na, xeyal sekinî, ku ez li kêleka te li bin barana devbihara rûniştim, dilê min sekinî…



Rizoyê Xerzî

rizoxerzi@gmail.com

## Jin hatin hewara mêr ketin kewara

Berî 2 rojan Konferansa neteweyî ya Jinên kurd li Amedê ji alî Tevgera Demokratîk a Jinên Azad ve hate lidarxistin. Di vê konferansê de 150 jinên kurd ji çar parçeyên welat û devreyî welat beşdar bûn.

Ji gava ku min bîr biriye û tê bîra min herdem gelê kurd û rêxistinên wan ên cuda banga yekitiya neteweyî dikim û bi sedê caran bang û amadekariyên konferanseke neteweyî hatiye kirin lê mixabin ew daxwaz tucaran pêk nehatiye. Jinên kurd di vê mijarê de pêşengî kirin û bi vê konferansê dikaribûn ku hest, fikir û daxwazên cur bi cur ên jinên kurd bi hevre parvebikin.

Êdî jinên kurd ne tenê di vê mijarê de pêşengî kirin lê wan piştî ku di pratîkê de dikaribûn konferanseke wiha giring pêk bînin û jinên kurd bighînin hev bang li kurdan kirin ku êdî bes e dem hatiye ku konferanseke neteweyî ya giştî bê lidarxistin û kurd li ser hîmên bingehîn ên daxwaz û berjewendiyên neteweyî li hev bikin.

Ez jî dengê tevî dengê jinên kurd dikim û bang li rêveber û serokê sazî û rêxistinên kurdan dikim ku ji bo konferanseke neteweyî vê terûbeya pîroz ji xwe re bikin mînak û rojek berî rojekê konferansa neteweyî ya li ser bingeha parastina nirxên gelê kurd bê lidarxistin.

Dibe ku di warê ziman de hin problem derketibin holê lê gunehê wê rewşê tev ji xemsariya me ya li hember zimanê kurdî pêk tê , sedemê bigehîn ê vê rewşê bêtir nebûna zimanekî yekgirtî ye.


Ez vê hewldan û çalakiya jinên kurd pîroz dikim û hêvî dikim ku siyasetmedar û rêveberên kurd vê pêşengiyê ji xwe re bikin mînak. Jin ji hemû beşên civakê bêtir zilm û zor dîtine. Di hemî dîroka wan de tadayên mezin li wan hatine çi ji alî sîstemê be çi ji alî malbatê û mêr be û çi ji alî şer û pevçûnan de be. Iewra jî pêşengiya jinan di lidarxistina konferanseke wiha de xwedî wateyeke taybet û pîroz e.

Her bijî jina kurd û bila hinekî pozê (poz ne bi wateya Colemêrgiyan) mêran bişewite û demekê berî demekê gavekê ji bo pêkanîna yekitiya neteweyî pêk bînin.

Bila ji kewarên berjewendiyên xwe yên rêxistinî û şexsî dûr bi kevin û berjewendiyên gelê kurd ji xwe re bikin armanc, wê gavê li şûna em gilî û gazincên qels li dijminê xwe bikin, kurd dikarin bi hêza yekitiya xwe hemû mafên xwe yên rewa li ser hemû cîhanê ferz bikin.

## XÊZIKNAME


Bes e hey hawar ! Bila êdî jin hêsir nebarînin !..




Piştgiriya rûreşiya tecawizê ya hikûmetê



Siyaseta qirêj ya li ser zarokan tê kirin




www.arsivakurd.org




# Elewîyan soz da, hetanê azadî meyro têkoşîn esto

**Elewîyan soz de ke hetanê mafanê xo yê merdimaney megê xo destan, dê tekoşîna xo ya, verê qetilan, zilm, zordarey û xapeynayişan de, tekoşîna xo daha gur bikerê û verê ra daha zêd xo amedeyê azadîya mafanê xo bikê**

Sazîya Çand û Pîr Sultan Abdalî, di encama kongreya xo a 11'in ya asayî de ard ziwan ke, lijna Pîr Sultan û heme herketanê elewîyan her rojî ra daha bi hêz o û di warê heq waştişî de çend gaman avera şîyo de, kombîyayiş viraşto û vat: "Humara şaxanê ma her ke şinê benê zêd. Endamê ma û potansîyela ma zê beno. Dîrokî de raya sifteyino ke, bê qatlîyam û bê merasîma cenazeyan bi se hezaran merdimî ma dakunê meydanan îşgal kenêy û waştişanê xo yê jûbiyişî û mafanê xo wazenêy."

Kongrede ame îşaretkerdiş ke, elewîyî indî heme çîyan qebûl nêkenê. Elewîyan fam kerdo ke qedera neheqey nîno qebûlkerdiş. Ewro heme der û doranê sîyasî heqê welatijey ra qal kenêy. No encamê têkoşîna jûbîyişî ameyo û vatîy: "Encama ke elewîyî resayê astê, sifte îktîdarî û înkarcîyanê dewamê Osmanîyan û senteza Îslam û tirkî zaf nerehet êy. AKP vatişanê xo de samîmî nîya. Polîtîkaya di rûyey dana meşdayiş. Çimkî sîyasetî de qirîterê samîmîyetî jû tenê yo û nameyê ey zî îcraat o."

**Koray û Ûgûr…**

Di encamnameyî eşkera kerdê ke, AKP di projeyanê xo yê derheqê elewîyan de samîmî nîya û vatîy: "Virazyayişê mevcût ya sîyasaley muhalefet zî ze AKP'î careserey ra dûr êy. Çareserey bi serê xo gere zagona 12 îlonî heme bêro bedilnayişî ra ravêreno. Heme şar gere xo tede bivîno û bikûrêy xebatan mîyan ke merdim bivajo çareserey beno. Feqet hetanê ney demî her demî de dîktatorey xo ra mînak girotêy."

Û hina ardî ziwan: "Korayê 12 serre Sêwaz de, Mêrdîn Koser de Ûgur Kaymaz amey qetilkerdiş. Hewnazî Failî belî nîyê. Di weşey de rejîma faşîst nêverdano ke ma avêra şêrê û pîl bibê ke xizmetanê weş biberê. Lazimo ke no sîstem wedaryo û perwerdeheya bi pereyin tikey bo zî wa boya xo bigero."

**AKP xapeyneno**

Di encamnameyî de, Elewîyê ke AKP wazeno bibo ti waxtî de dê nêbo û yeno vatiş: "Eger biveşnê û bikişê zî, nêşenê elewîyan teslîm bigerêy. Tikey rayîran de wazenêy ke elewîyan bixapînêy, ema, ma dê, hemeyan veng bivejê. Veng vetiş bi heşê ma, bê qiwet û şîdet dê bi sîyesetî, bi çand, bi pênûs û dilê xo ma bibo û senî ke dewra Muavîye veng vejya se dê no dewrî zî elewîyî veng bivejê.

**Hetanê bibê têkoşîn esto**

Encamnameyî de yeno vatiş ke: "Serede Madimak û heme qetlîyamîy û cînayetanêy sîyasî gere bêrê eşkerakerdiş. Madimak bibo muzeya şermî. Dersanê dînî, wa wedaryo. Kêyê caman statûya fermî gere bigêy. Dulemeya ke mîyanê elewîtey û yên bînan de estê gere bêrê wedarnayene. Kenekanê Dêrsimî yên ke vinî bîyê gere bêrêy vînayiş. Sefalet û feqîrey gere biqedyo. Verê çixara kesanê ke wazenê xozayî xo ra bikê sermaye gere bêro girotiş. HES'îy gere bêrê vindarnayiş û girotiş. Hetanê ke sifreya biratey yeno ronayişî elewîyî dê rayîra xo ya raştîn de rayîr bigê." **(ENQERE / DÎHA)**

# TOKÎ, toqê husteyê dewletî yo

Ehmedê BIRA / AMED

TOKÎ ya Uçkûyûlara Amedî de problemî yenê pînekerdiş. Yanê çareserey çîn o. Serrê ra zafêreyo ke kêyî kewtê bonanê xo, ema newe newe cayanê bi arize, bi borîyanê qinalîzasyonî gora fotoyanê Şaredareya Gird ya Amedî ke, 1000'î ra zafêrey cayan de xirabebîyiş bîyê. Ney semedî ra, şaredarey çira ke, problemê ney cayî zaf zaf êy ra, TOKÎ ra dewr nêgiroto.

TOKÎ'ya Ûçkûyûlara Amedî, bi serrano ke problemanê xo nêqedînayo. Na ray zî qilalîzasyona ke kişta şîrketa OLMEZ înşaatî ra amebi viraştiş, semedê ke weş nîyameyo viraştişî ra, 1000 cayan ra zafêrey, borî ameyo jûbînî, ya zî teqayo û eşto.

Şaredareya Gird ya Amedî fotoyanê qinalî di binê erdî de antbi û dewrgirotişê TOKÎ qebûl nêkerdibi.


**5 milyarî ra zafêrey zirar**

Şaredarey gere par TOKÎ teslîm bigirotaynê. Weneyê borîyanê qinalîsazyonî atn ke 1000 cayan ra zafêrey arize estêy. Gora vatişanê înan yê taxmînî 5 mîlyaran ra daha zêd, gere mesref bêro kerdiş ke, bikûro esasê xo mîyan. Ney ra, hetanê ewro şaredarey dewr nêgiroto.

Qabê dewr bigiro ra, TOKÎ cayê ke arizeyî estbîy bi pîneyanê xo, keno ke weş bikero!

**Rayîrî heme xirabe yê**

TOKÎ ya Ûçkûyûlarî de, herî tayn her rayîr 2 rayan ameyo kenayiş û viraştiş. Ney semedî ra, şar, TOKÎ ra zaf bi qahr êy. Û şarî mîyan de, yeno vatiş ke: "TOKÎ dijminê dewletî yo." Semedê vatişa şarî ya wina zî, her çîyê ke nêweş viraştê herî kemî 2-3 rayan viraştê ra yo. Şar rayberdoxanê TOKÎ ra wazenê ke wa çîyanê ke ney demî ke TOKÎ de virazyenê, wa weş bêrê kontorkerdene ke, wa rayna xizneya dewletî ra pere meyro antiş û şar meyro şelandiş. Çimkî her raya ke rayîr yeno xirabekerdiş mesref yeno kerdiş. No mesref heme xazîneyî ra vejyeno.



**Rayberdoxî kontrol ...**

Şarê TOKÎ'yî wazenê ke rayberdoxî karanê ke newera yenê pînekerdişî sero bivinderê ke wa rayna meyro xirabekerdiş.

Gora ke şar vano şîrketa OLMEZ'î zaf bi hêsan karê pînekerdişî nêkeno. Ne amûrê pîmitiş û kodî dano, 'Nîvo' felan û bêvan nîno bikarardiş û waxta ke serê borîyanê qinalî pir keno, bi loqî nêşideynenê.

No zî dê bibo semedê rayîra kert û bi kortin. Yanê rayîra ke cayê kenayeye yo de, eger bêro viraştiş se, binê wesayitan dê bigino rayîrî. No zî dê bibo semedê wesayitîy de arizeyanê girdan bibo.

Ney semedan û yên ke nînê zanayişîy dê bivjeyê û no zî dê bibo semedê têkşîyişê serweta mîllî ya Tirkîyayî. Qabê ke ney kert û kortî û zewnbînî, herî kemî bibê ra, wa rayîrberdoxanê TOKÎ, kontrolanê xo zaf zêd bikerê ke mebê dijminê serweta dewletî.



İrfan Babaoglu
irfanwelat@hotmail.com

## Ziwanê ma dimilkî -I-

Ziwan çiyê do ganî yo, zindî yo.

Ziwan miyane merdiman de ebûrê, (navgin, hacet) resnayiş (dayiş-girewtiş) o.

Tenya eresnayiş, dayiş û girewtiş, an zî ebûrê vajyayişî nê, ebûrê/hacete fikiriyayişî yo zî.

Miyanê, (navbeyn, beyntare) ziwan û fikir, ziwan û merdimbîyîş û ciwatbîyîş de têkilî û giredayîyê de zaf xurtîy estêy.

Her ziwan merxaleyê tarîxî de virazyeno, gird beno, şîn beno û bê amor (humar) şikl û veng awa keno û zengîn û dewlemed beno.

Ziwano ke kesî pê qal kenê, qisey kenê estbîy, o wext o ziwan zî esto. Heke yew (jû) merdim bo zî, ke bi ey ziwanî qal û qisey kenê, o wext o ziwan ganî yo, zindî yo. Labalê ey merdimî bimirê o ziwan zî mireno.

Ewro ziwanê ke nêyenê qalkerdişî zî estêy. Zey ziwanê sumeran, aqatan û ey bînan.

Kişta bine de zî, tay ziwanî zî estêy ke, sero nêyero vinderdiş, bi awayêko civakî, siyasî û rayxistinî ardim nêkero, paştgirewteyî weş nêdo, do bimro. Nêy ziwanan ra ziwanê ke binê xetereyî de yê yeno vatiş. Seba ke ney ziwanan tenya kal û pîrî zanê û êy kisey kenê. Gedey bi ney ziwanan perwerde nêvînenê. Yanê gedeyan bi ziwanê xo yo makî (dayike) nêmusenê.

Gorey raporanê Unesco zarawaya (ziwanê dimilkî/zazakî/kirmanckî), yanê gorey vatişê sersimijan, kirmanckî miyanê ney ziwanan de ya.

Ziwanê kirmanckî lehçeya ziwanê kurdî ya. Na raştî, nîna maneyî ke zazakî yew ziwan niya. Zazakî, miyanê çar zarawayanê kurdî de yew zarawa ya.

Nêy semedan ra, ma wazenê ke zarawaya dimilkî sero tay bivinderê.

Zarawaya dimilkî, kurdî ke miyanê komê ziwananê Hind û Ewrupî de ca gêna. Ziwanê Awesta ke ziwane do kan o û ziwanê farisî ya kane nizdiyê ziwanê Zazakî yo.

Ma vat ke, ziwan yew çîyê do ganî yo, zindî yo. Ewta de yew zindîbîyayiş ganîbîyayiş û dageyrayiş (dunuşum) vejîyeno verênîya ma. Miyanê kitaba Awesta de, ziwanê Zerduştî de û ziwanê Qesra Med û Persan de tay nuştey û tay metnî estê ke, zey ziwanê zazakî ya ewroyin êy. Yeno famkerdiş ke zazakî, miyanê ziwanê kurdî de ziwanê do kan a.

Komê civatanê kurdan ê ke bi zazakî qal û qisey kenêy, zafêrî koyan sero û cayo ke hêza ixtîdar/destserdare (merkezî otorîte) nêşîkayê bindest bikerê de juyayê. Na rewşe zî îmkanêy ke bieşkê ziwan û kilturê xo bipawê dayê înan. Lehçeyêy bînî, dekewtî binê tesirêy Osmanîyan, farisan û ereban. La lehçeya Zazakî na rewşe de mîrazê (cewher) xo pawit.

Cayanê ke bi zarawa (lehçe) zazakî Qisey kenê zafêrî mintiqaya koyan o. Na mintiqa miyanê vakur (bakur) de, Erzingan û acêr (cenub) de robarê (çemê) Muradî de ca giyena. Ûta de vila biyo çoşmey xo.

Ciwatêy ke bi zarawaya Zazakî qalî kenêy nizdîy hîrê milyonan êy.

Kesêy ke bi zarawaya Zazaki qisey kenêy taye cayan de nameyê ciyayan bikar arenê. Zey nimunî (mîsale) mintiqaya Çewlikî bi nameyê zaza yeno nasnayiş. Çoşmey rubarê Firatî de înan ra vanê Dimilî. Kişta Dêrsimî zî lehçeya ke qisey kenê ra vanê Kirmanckî.

*Dom keno.*

www.arsivakurdi.org

Rupel 12++++++++++:Layout 1 27.04.2010 15:09 Page 1

ROJEV
28 Nîsan 2010 Hejmar: 29 Sal: 1

# Koçer ji ber operasyonan tên astengkirin



Koçerên ku debara xwe bi sewalkariyê dikin, bi hatina biharê re berê xwe didin zozanan. Li Dêrsîmê ji ber operasyonên leşkerî koçer nikarin biçin zozanên xwe û gotin ku wisa biçe dê dest ji koçeriyê berdin

Li Dêrsimê koçerên ku debara xwe li zozanan bi sewalkariyê dikin, ji ber operasyonên leşkerî nikarin biçin zozanên xwe yên li Çiyayê Mercanê.

Koçerên ku bi salan in, li çiyayên Munzurê bi sewalkariyê debara xwe dikin, ji ber operasyonan demên zor derbas dikin. Koçer, bi hatina biharê, ji Mazgêrt, Pêrtek û Pilûr, koçê çiyayên Mercanê dikin, diyar dikin ku wiha biçe ji ber operasyonan dê dest ji koçeriyê berdin. Koçer dixwazin ku di zûtirin demê de operasyon bên rawestandin û bikaribin bi awayekî azad biçin zozanên xwe.

**'Bila bibin rojeva Meclîsê'**

Koçerê bi navê Hasan Erel diyar kir ku ev 20 salên bi rehetî nikarin biçin, zozanên ji bav û kalikên wan ji wan re maye û der birî ku wiha biçe dê ji ber van operasyonan li herêmê sewalkarî di qe de. Erel, wekî mînak balkişand ser penîrê Dersimê û got ku demekî ev penîr îxracatî welatên Ewropayê dibûn, lê niha ji ber vê rewşê êdî ji bo vwarinê jî penîr nayê hilberîn

Ji koçeran Alî Şavakli, jî destnîşan kir ku li rojavayê welêt ji bo sewalkariyê kredî tên dayîn û ani ziman ku ew li vir ji dewletê tiştekî naxwazin, bes divên dixwazin biçin zozanên xwe. Koçer Bektaş Duman ku ew jî nikare ji sedema operasyonan nikare biçe zozanan jî nerazîbûna xwe anî ziman û xwest ku qedexekirinên zozanan bînîn rojeva meclîsê. Bektaş, di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku hikûmet, di aliyekê de ji bo bidawîkirina krîza goştî riyên çareserkirinê digere lê di aliyên din de jî bi qedexekirina zozanan derbeyî li sewalkariyê dixe. **DÊRSIM**

# Ji zêdebûna vîtamînan jî mirov nexweş dikeve

Li gorî pîsporan zêdebûn yan kêmbûna vîtamînan di nav laşê mirov de dibe sedema çendîn nexweşiyan û yên herî diyar jî kêmxwînî, nexweşiya ceger, tansiyona xwînê, hişikbûna çerm û pençeşêr in. Her wiha karê gurçikan dişewitîne, guhertin di çerm û neynokan de rû dide, por diweşe û hestî diheline.

**Cureyên vîtamînan**

Bi awayekî giştî 13 cure vîtamîn hene. A, C, E, K, B û di heman demê de Tiyamîn (B1), Rîboflavîn (B2), Niyasîn (B3), Pantotenîk asît (B5), Pîridoksîn (B6), Kobalamîn (B12).

**Çavkaniyên vîtamînan**

Vîtamîn D bi tava rojê re di laşê mirov de çê dibe. Lê belê hinek xwarin jî hene ku ger ew vîtamîn di laş de kêm bibe, dikare sûd jê bê wergirtin. Derbarê çavkaniyên vîtamînan de jî, pisporê nexweşiyên hinavan Dr.Yûsif Bihadîn dibêje: "Vîtamîn A zêdetir di gêzer, sebze, bi giştî di hemû fêkiyan de, şîr û berhemên wê de heye. Vîtamîn B, B12, B6, B5, B2 û B1 bi giştî di sebze, kartol (patat), temate û gişt pelên kesk de heye. Vîtamîn C di porteqal, lîmon, lalengî, bi giştî fêkiyên mizir de heye. Vîtamîn E di xwarinên bi dohn, goşt û ceger de heye. Vîtamîn K di xwarinan de nîn e. Di nav riviyên mirov de cure bakteriyek vê vîtamînê çê dike."

Vîtamînên ku di nav avê de dihelin. Wek vîtamîn C û vîtamîn B. Lewre bo demeke kêm di laşê mirov de dimînin û laş jî bi riya gurçikan wan davêje derve. Lê belê vîtamîn B12 ku ew jî ser bi wan vîtamînan e ku di avê de dihelin, di cegerê mirov de kom dibe û karîna wê ya helînê 6 sal in. Xwarina xorakên ku ew cure vîtamîn tê de hene, pêwîst e bi berdewamî di danên xwarinê yên rojane de bên xwarin. Ya baş jî ew e ku bi terî û bi saxî bên xwarin, bi taybet jî sebze. Ji ber ku piştî kelandinê sûdên ku tê de hene, namînin.

**Bi jehrê ketin**

Ji bilî vîtamîn C û B6, pirxwarina vîtamînên ku di avê de dihelin, di nav laş de nabin sedema jihrîbûnê û zirarê nadin laş. Zêdebûna vîtamîn C di nava laş de dibe sedema gêjbûn, zikêşî û hinek caran jî kevirên çurçikan çê dike. Zêdexwarina vîtamîn B6 jî dibe sedema têkçûna demarên mêjî û bêhêzbûna dest û tiliyan.

Vîtamînên ku di duhin de dihelin. Wek vîtamînên D, A û E. Ev vîtamîn digel dohn di nava rîviya zirav de dihelin û tevlî xwînê dibin.

Ev vîtamîn di cegerê mirov de kom dibe û dikare bo dema çend salan di laşê mirov de bimînin.

**Kêmbûna di nava laş de**

Dr.Yûsif Bihadîn dide zanîn ku kêmbûna her cure vîtamînekê di nava laş de dibe sedema nexweşiyan. Baştirîn rê ji bo zanîna kêmbûna vîtamînan di nav laş de, çûndina bijîşkan e. Ji ber ku bikaranîna vîtamînan jî bêyî sedem, dikare bibe sedema têkdana hevsengiya madeyên din di nava laşê mirov de.

Lê belê di hinek haletan de bikaranîna wan vîtamînan pêwîst e. Bo nimûne ji bo hevsengkirina kêmiya vîtamînan di nava laş de wek hatela ducanî, şîrdayîna zarokan, zarokên sava, mirovên bi temen, kesên vejeteryan û kesên ji bo xwezeîfkirinê parêzê dikin.

**Giringiya vîtamînan**

Dr.Yûsif destnîşan dike ku nebûna her yek ji vîtamînan dê bibe sedema têkdan yan zirargihandin bi beşên laşê mirovan. Bi giştî vîtamîn ji bo endamên laş girîng in.

***Vîtamîn :*** Madeyên pêwîst û bi sûd in. Lê belê zêdexwarin, yan kêmxwarina wan dibe sedema zirar bo endamên laşê mirov û derketina nexweşiyan. Wate vîtamîn çi kêm bibin yan zêde, dê me tûşî pirsgirêkan bike.Zêdebûn yan kêmbûna vîtamînan di nav laşê mirov de dibe sedema çendîn nexweşiyan û yên herî diyar jî kêmxwînî, nexweşiya ceger, tansiyona xwînê, hişikbûna çerm û pençeşêr in. Her wiha karê gurçikan dişêwîne, guhertin di çerm û nînokan de çê dibe, por diweşe û azara hestiyan çê dibe.Mînak zêdebûna vîtamînan di nava laş de, mirov bi van nexweşiyan dixe; Zêdebûna vîtamîn A di laş de dibe sedema tansiona xwînê û karê gurçikan dişêwîne. Di heman demê de guhertin di çerm û nînokan de çê dibe û dibe sedema weşîna pore mirov û azara hestiyan.

Zêdebûna vîtamîna B3 dibe sedema birîndarbûna madeyê. Weşîna por. şewata damarên ceger û di lêdana dil de jî pirgirêkan çê dike.

Zêdebûna vîtamîn B6 dibe sedema bêhêziyê, şewata boriyên xwînê û kêmbûna oksejînê di nava laş de.

Zêdebûna vîtamîn C jî dibe sedema çêbûna Kalisyomê, stûrbûna boriyên xwînê û çêbûna xaneyên pençeşêrî.

Zêdebûna vîtamîn D, dibe sedema zêdebûna rêjeya Kalisyomê, tansiona xwînê û çêbûna kevirên gurçikan.

Zêdebûna vîtamîn K jî dibe sedema têkşikana xwînê û zarokên nû ji dayî bûyî jî bi nexweşiya zerikê dixe.

Tevî vê yekê, kêmbûna vîtamînan jî laş tûşî pirsgirêk û nexweşiyan dike.

Kêmiya vîtamîn A dibe sedema şevkoriyê, zeîfbûna çavan, pirsikên rû, hişikbûna çerm û kêmbûna parastinê di laş de.

Kêmbûna vîtamîn B'yê dibe sedema bêhêzbûna laş, çerm, têkçûna karê masûlkeyan.

Kêmbûna vîtamîn C, dibe sedema şeqbûna lêvan, tûşbûn bi petaya sermayê, kêmxwînî û geşenekirina laşê zarokan.

Kêmbûna vîtamîn D jî dibe sedema nexweşiya hestiyan û derengmayîna geşekirina laş.

Kêmiya vîtamîn E, dibe sedema nezayokî û reşbûna didanan.

Kêmbûna vîtamîna K jî dibe sedema zûberbûna xwînê.

*(PUKmedia)*

**Vîtamîn çi ye?**

Vîtamîn pêkhateyeke têkil e ku xaneyên laşê mirov ji bo geşekirinê pêwîstî pê heye. Çimkî ji madeyên kîmyawî pêk tên û ji bo parastina laşê mirov giringiyeke wî ya zêde heye. Vîtamîn di salên 1820 hetanî 1910'an de hatin kifşkirin. Zanyar dibên ku hinek nexweşî ji ber kêmiya vîtamînan tûşî mirovan tên. Di karîna laşê mirov de nîn e ji bilî vîtamîn D tu vîtamînekê çê bike.

# Pîşeya goşkarî tune dibe

Li Antakyayê pîşeya goşkarî ya 65 salan bi tunebûnê re rû bi rû ye. welatiyê bi navê Mehmet Gurbuz (81) ku goşkariyê dike diyar kir ku li bajar niha ew tenê vî karî dike.

Gurbuz anî ziman ku demekê pêlavê Yemenî gelek eleqe didît û niha tenê ji aliyê folklorîstan ve eleqeyê dibîne.

Pîşeya goşkarî ku niha bi tunebûnê re rû bir û ye welatiyê bi navê Mehmet Gurbuz didomîne. Gurbuz der barê xetereya ku pîşeya wî pê re rû bi rû ye axivî û diyar kir ku ew bi fikarek ku dê pîşeya wî jî bi wî re tune bibe. Gurbuz da zanîn ev 65 sal in bi çermên reng bi reng pêlavên Yemenî çêdike û her wiha bi awayekî tîtîz karê xwe dike. Gurbuz wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ez 81 salî me. Di salên ewil de ez bi fransiyan re xebitim. Em bi ermenî û yahudiyan re xebitin. Di nava me tu carî alozî derneket. Em wekî bira bûn. Dema fransiyan gelek zehmet bû. Xizanî zêde bû. Lê ligel vê eleqeya ji bo Yemeniyan wê demê zêdetir bû. Welatiyên gundan dihatin û Yemenî ji bo xwe dikirîn. Bi taybetî gundî hatin pazarê û pêlav ji ji bo xwe dikirin. Ger ku dawet hebûna wan jî zêde dikirin."

**'Ekîbên govendê dikirin'**

Mehmet Gurbuz anî ziman ku di demên dawî de Yemenî li dijî teknolojiyê têk çûye û niha tenê ekîbên govendê dikirin. Mehmet Gurbuz wiha dirêjî da axaftina xwe got: "Berê Yemenî ji bo kesekî gelek girîng bû. Lê niha pêlavên modern derketine. Yemenî jî ji holê rabûn. Êdî turîst û ekîbên govendê dikirin. Min nexwest zarokên min vê pîşeyê hîn bikin. Ji ber ku êdî qet eleqeyê nabîne. Ez jî çend salên din dê vî karî nekim."

Serokên Yekitiya Odeya Esnaf û Sanatkaran a Hatayê (HESOB) Aç Kadîr Tekgoz ji ber ku Gurbuz qedeke mezin daye vê pîşeyê plaketeke serkeftinê da Gurbuz. **(HATAY / DÎHA)**



# Turnuvaya futbolê ya Misircê dest pê kir



Turnuvaya Futbolê ya Biharê a Hali Sahayê ya ku her sal ji aliyê şaredariya navçeya Misirca Sêrtê ve tê lidarxistin, dest pê kir.

3'yemîn Turnuvaya Futbolê ya Hali Sahayê a Şaredariya Misircê bi tevlibûna 36 tîmî dest pê kir. Serokê BDP'a Misircê Abdulgafur Kubîlay, Şaredarê Misircê Necat Yilmaz, endamên meclîsa şaredariyê û gelek kes tevli turnuvayê bûn. 36 tîm tevli turnuvayê bûn û her wiha ji van tîman 9 kom hatin avakirin. Beriya ku turnuva dest pê bike şaredarê Misircê Necat Yilmaz axaftinek kir û diyar kir ku armanca wan a sereke ya pêk anîna turnuvayê ew e ku, girîngiya ku partî û şaredarî didin ciwanan bila derkeve pêş. Yilmaz wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev turnuva dê bibe wesîleya têkiliyeke baş ya ciwanan. Şaredarî her tim ligel ciwanan e. Her tim jî dê bi pirsgirêkê ciwanan re eleqeder bibin. Her wiha me ji bo ciwanan di bana şaredariyê de navenda çand û hunerê ya ciwanan vekir. Divê ciwanên me xwedî li van saziyan derkevin."

Maça ewil ya turnuvayê di navbera Medya 56 û Muxtariya Taxa Tekelê de pêk hat. Her wiha ewil jî şaredarê Misircê Necat Yilmaz li gogê da. **SÊRT**

www.arsivakurdi.org